

18 hezar leşker winda ne

BÎLANÇOYA ARTÊŞ û WÎKÎPEDÎAYÊ

BERIYA çend rojan artêşa tirk bi bilançoyekê têkildarî yekûna leşkerên xwe agahî dan, tişta balkêş ew e ku hejmara serfermandariya tirk û hejmara wîkîpedîyê ya meha kanûna 2016'an hev nagirin. Li gel leşkerên girtî, îxraçkirî, fîrarî û kuştî 18 hezar leşkerên tirk winda ne.

HPG'Ê BÎLANÇOYA 2016 AŞKERA KIR

NAVENDA Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê bilançoya şerê 2016'an aşkera kir. HPG'ê diyar kir ku 38 jê bi rutbe, 3404 leşker û polîs hatin kuştin û wiha hat gotin: "Balafirekê şer a F-16, 3 helikoptêr û 8 tang, 166 wesayîten zirxî hatin rûxandin û 585 gerîla şehîd ketine."... RÛPEL - 3



ROJEVA Medya

4 Çile Çarşem 2017 / e-mail: rojevamedya@hotmail.com / Buha: 1 TL Hejmar: 55

Sê jinên azad bi bîr anîn



Di ser sulkasta sê jinên azad Sakîne Cansiz, Fidan Dogan û Leyla Şaylemez re 4 sal derbas bûn. Jin li daw û doza wan xwedî derdikevin û dibêjin ew ê bi têkoşîna xwe îdealên Sarayan pêk binin... R2



Pêşmergeyan got gerîla dê li Şengalê bin

Pêşmergeyan got ku gerîla welatê xwe diparêzin lê artêşa tirk li Başûr dagirker e û xwest artêşa tirk ji Başûr derkeve

PÊŞMERGEYAN li Qendîlê daxuyanî da û bertek nîşanî daxuyaniyên rayedarên PDK'ê dan û destnîşan kir ku ew ê destûrê nedin şerekî din ê birakujiyê û anî ziman ku tu hêz nikarin PKK'ê ji Şengalê derxin...

RÛSPIYÊN AMEDÊ xwest rojek ji rojekê zûtir kurd yekitiya xwe pêk bînin. Rûsîyan destnîşan kir ku bi lidarxistina Kongreya Netewî ya Kurdistanê dê kurd bikarin deskeftiyên xwe û siberoja xwe biparêzin... R-7

Nikarin vî welatî bi rê ve bibin

Berdevkê HDP'ê Ayhan Bîlgen di komcivîna partiyê de axivî û diyar kir ku AKP êdî nikare vî welatî bi rê ve bibe. Li aliyê din serokwezîrê tirk Bînalî Yıldırım jî di komcivîna de li xwe mikur hat û got: Kılıçdaroglu rast dibêje, em ê rejîmê biguherînin... R.7

OHAL'ê dolar buhatir kir

Sînyala dirêjkirina dema OHAL'ê dolar buhatir kir. Dolar li dora 3.60 TL'î diçe û tê. Li aliyê din ji ber buhabûna dolar şirket nikarin deynên xwe bidin. Ji bazarê heta turizmê aboriya Tirkiyeyê ketiye turbulansêke mezin... R.6

Planê Toledo ya AKP'yî dîyar bî

Seba Sûrî 6 qereqolî

Projeyo ke hukmat seba qezaya Sûrî ya tarîxî amade kerdbî, dîyar bî. Hukmat wazeno Sûrî bîaçarno herêmêka 'biewle' û nê semedî ra Sûr de 6 qereqolanê girdan virazeno

NIMÛNEYA TOLEDO AMEYBÎ DAYÎŞ

Qezaya Sûrî ya Amedî de netîceyê pêrodayîşê ke 28ê teşrîna peyêne ya 2015 de dest pêkerdbî û 104 rojan domîyabî de hetê hêzê dewlete ra tarîxêk ame qedênayîş. Serekwezîr, wezîr û parlamenterê AKP'yî verê cû seba qezaya Sûrî nimûneya bajarê Toledo daybî.

6 QEREQOLÊ GIRDÎ YENÎ VIRAŞTÎŞ

Projeyê hukmatê AKP'yî aşkere bî û goreyê projeyî do Sûr de 6 qereqolê girdî bêrî viraştîş. Reyna rayîrê hîra yê ke nê qereqolan yewbînan ra bibestî do bêrî viraştîş. No proje hetê Şirketê Plankerdîşî yê BHA ra yeno meşnayîş û ti eleqeya xo tarîx û kulturê Sûrî reyde çin o. RÛPEL - 11



Vîrê tarîxî yê Fîskaya rijîyeno

Taxa Fîskaya ya Amedî ke netîceyê veşnayîşê dewan de awan bibî, pêrodayîşê Sûrî ra dima nika na taxe zî çarçeweya îstîmlakerdîşî de rijîyayîşî reyde rî bi rî ya. R - 11

Azadiya Ocalan xwestin

Mamosteyên jin ên Kobanê ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd çalakî li dar xist û xwest Ocalan azad bibe. Li Êlihê jî jinan heman daxwaz anî ziman. Li aliyê din serlêdana malbatê ya ji bo hevdiîtinê dîsa hat redkirin...R-7

Li Rihayê Auschwitza AKP'ê



Parlamenterên HDP'ê yên Rihayê Osman Baydemîr û İbrahim Ayhan têkildarî îşkence, zext û pêkutiyên li Rihayê li hemberî kurdên ji aliyê polîsan ve hatine dîlgirtin, li meclîsê daxuyani da. Baydemîr û Ayhan da zanîn ku AKP'ê li Rihayê kampeke berhevkerinê ava kiriye... RÛPEL - 6

GIRTÎGEH KIRINE malên mirinê

ÎHD'ê têkildarî zext û pêkutiyên li girtîgehê li dijî girtiyên ten meşandin daxuyani da û diyar kir ku girtîgehê veguherîne malên mirinê. ÎHD'ê banga hestyariyê li civakê kir... R.3

Zimanê neyaran û Nêçîrvan(î)...

R6

Nivîsa Mihyedîn Melko

Dawiya wan bi destê wan be

R7

Nivîsa Fehîm Işık

Fragmanê 2017î

R10

Nivîsa U. Serhildan Xoncikij



Keçên xwe bidin xwendin

SEVÎLAY BAYRI ya 31 salî ji bo xwendinê rasti astengiya malbatê tê û di 12 saliya xwe de tê zewicandin. Hevjînê wê bi awayekî sistem- atîk îşkenceyê lê dike û di duyemîn sala zewaca xwe de ducanî dimîne. Bi zaroka xwe re mezin dibe. Bayri anî ziman ku bi dehan jinên wek wê avêtine nav agir û got bila kes desturê nede van pêkanînan û wiha got: "Keçên xwe bidin xwendin. Nezewicînin û mehîkumî zilaman nekin." Bayri diyar kir ku li kolanan diûst, nedizanî zewac çî ye, lê piştî ku zewiciye fêhm kiriye ku zewac çî qas tiştêkî zehmet e û mafê wê yê zarokatiyê jî destê wê girtine. Bayri da zanîn ku tevî ev qas dem derbas bûye jî dest ji xwendinê bermedaye û got ku wê rolên li jinan hatine ferzkirin, qebûl nekirine. Bayri destnîşan kir ku wê bi veşartî xwendiyê û dê nehêle ku jiyaneke wekî ya wê jî keça we bimîne. Bayri anî ziman ku wê di jiyana xwe de her tim têkoşîn meşandiye. WAN - ŞÛJIN



4 Çile 2017 Çarşem

Fatma Uyar:
Li dijî zilaman
SERÎ NETEWÎNIN



Fatma Uyar a ku yek ji 3 jinên li Sîlopiya Şîrnexê hat qetilkirin e. Uyar di 28'ê tebaxa 1988'an de li gundê Duhokê Gabarê tê dinê. Uyar di malbatê de di nava 7 zarokan de zaroka duyemîn e. Piştî ku Uyar hat dinê malbata wê li navenda Şîrnexê bi cih bûye. Uyar di 2000'an de têkoşîna siyasî nas dibe û tev li têkoşinê dibe û destpêkê beşdarî nava refên ciwanan dibe. Uyar di 2009'an de hat girtin û 5 salan di girtîgehê de ma. Piştî ku Uyar hat girtin, piştî salekê bavê wê Reşîf Uyar jî hat girtin. Uyar ku bi bavê xwe re sal û nîvêkê di girtîgeha Mêrdînê de ma, piştî sêgûnê girtîgeha Sêrtê hat kirin. Uyar piştî ku 3 sal û nîvan di girtîgeha Sêrtê de ma hat teliyekirin. Uyar piştî ku tahtiyê bû di sala 2010'an de li Botanê tev li nava têkoşinê bû. Uyar herî dawî di sala 2015'an de di nava KJA'yê de xebatên xwe berdewam kirin.

Uyar ku li Botanê xebat domandî di 4'ê çile ya 2016'an de dema îlankirina xweseriyê de ku dewletê êrîşên hovane li hemberî gel pêk anîn, bi 2 rêhevalên xwe yê siyastemdar re hat qetilkirin. Wekî li Parîsê di 9 Çileyê 2013'an de Sakîne Cansîz, Leyla Şaylamez û Fidan Dogan, li Sîlopiyê jî sê jinên têkoşer Fatma Uyar, Sêvê Demîr û Pakîze Nayîr jî bi guleya dijîminê hov hatin qetilkirin.

NASKIRINA FATMA

Li gel sozê hemû jinan ê ji bo Fatma, Sêvê û Pakîzeyê ku digot dê ala wan a têkoşinê dewr bigirin, malbat û hevalên Fatmayê der barê wê de axivîn û wiha gotin: "Her digot li dijî zilaman serî netewîn in û jineke bi hêz bû. Naskirina Uyar girîng bû. Uyar gelek nîrx dîda hevalên xwe û gelek ji wan hez dikir." Li gel ku kujerên Uyar û hevalên wê nehatin diyarkirin û nehatin darizandin dayika Uyar jî bi îdiaya "endama rêxistinê ye" di 24'ê kanûnê de hat girtin. ŞÎRNEX - ŞÛJIN

'Erka me ya sereke ronîkirina komkujiyê ye'

Fermadara YJA Starê Çîgdem Dogu têkildarî komkujiya Parîsê axivî û destnîşan kir ku ji bo wan esas domandina doza her sê hevrêyên wan e û got ku erka wan a bingehîn ronîkirina komkujiyê ye

ROZA AMED / BEHDÎNAN - ANF

Yek ji Fermadarên YJA Starê Çîgdem Dogu têkildarî Komkujiya Parîsê daxuyaniyek da ku sê jinên şoreşger yek jê avakara PKK'ê Sakîne Cansîz (Sara), endama KNK'ê Fidan Dogan (Rojbîn) û endama tevgera ciwanan Leyla Şaylamez (Ronahî) hatibûn qetilkirin. Dogu di sêyemîn salvegera şehadeta Sara, Rojbîn û Ronahiyê de ew bi bîr anîn.

Dogu diyar kir ku bêguman hevala Sara yek ji nîrxên herî mezin ên têkoşîna wan a azadiyê bû û wiha got: "Hevala Sara bi PKK'ê re şahidî jî destpêka têkoşîna Kurdistanê re kir û di hemû qonaxên vê têkoşinê de jiyana wê bi şerekî giran derbas bû. Nasnameya wê jî rastiya îsyane, rastiya gelê Dêrsimê bû. Mirov dikare bibêje ku di şexsê hevala Sara de rapêrîna Dêrsimê bûye PKK."

Dogu destnîşan kir ku bingeha tevgera azadiyê ya jinên kurd jî Cansîz tê û wiha dewam kir: "Bi têkoşîna xwe ya azadiya jinan, PAJK û pergala KJK'ê re, di roja îro de li hemû qadên

civakî, li Kurdistanê, Rojhilata Navîn û li gelemperiya cihanê rastiyeke me ya têkoşinê heye û bûye mînak. Ya ku bingeha vê amade kir jî hevala Sara bû. Ew bû rastî, hiş û mejiyê me ye." Dogu da zanîn ku lêgerîna bingehîn a Cansîz lêgerîna mirov e, lewma jiyana wê her tim di nava şer û têkoşinê de derbas bûye. Dogu bal kişand ser berxwedana Cansîz a li zindanê û wiha pê de çû: "Di gerilabûn û artêşbûna jinan de, berxwedana hevala Sara ya li girtîgeha Amedê û nasnameya ku wê afirand, bû bingeha hêzeke mezin a gerilayên jin."

LI HER QADÊ BÛ

Çîgdem Dogu diyar kir ku Cansîz piştî ku ji girtîgehê derket tev li nava karê artêşbûna jinan bû û wiha dewam kir: "Hem tev li xebatên me yê diplomatîk, hem jî yê birêxistinbûna li qada civakî bû. Li her qada têkoşinê bi awayekî çalak cih girt û encamgir bû."

Têkildarî mirina qatîl Omer Guney jî Dogu ev tişt ragihand: "Ev rewş cihê gumanan e. Rûdana bûyereke bi vî rengî



beriya destpêkirina dadgehê, cihê gumanan e, ji bo tarîkirina delîlan e. Hewl tê dayîn ev bûyer bê nixumandin. Me di destpêkê de jî got, ev yek komployeke navneteweyî ye. Komployeke hêzên navneteweyî ye ku MÎT'a tirk jî di nav de ye. Di pêvajoyeke bi vî rengî de ev bûyer jî vê rastiye îspat dibe. Bêguman wek tevgera jinan em ê dest ji vê dozê bernedin û her tim şopdarên wê bin. Ji bo me ya bingehîn ew e ku em bîranîna her sê hevrêyên xwe yê hatin qetilkirin bidomînin û ji wan re bibin bersiv. A din jî erka me ya sereke ronîkirina komkujiyê ye."

'Ew di her keliyê de hêze dide me'

FERMADAR ÇÎGDEM Dogu destnîşan kir ku Cansîz fermana têkoşîneke mezin dide û wiha axivî:

"Pêvajoyê qasî giran dibe bila bibe, wek şoreşgerê jin, mirov dikare ji hemû astengiyên derbas bibe. Ger mirov jî têkoşîn, bîrdozî, gel, rêber û hevrêyên xwe piştrast be, tu astengî nikare li pêşîya mirov bigire. Gelekî girîng e ku em mîrîna ku ji me re hiştiye, mezin bikin. Ji ber vê yekê gelek tiştên divê em bibêjin, hene. Kuştina hevala Sara û du hevrêyên me li navenda Parîsê, em gelekî êşandin. Ev yek di heman demê de nîşaneyê hêrs, nefret û tohildana dijîmin a li zindîbûn û berxwedana jinan e. Piştî şehadeta hevala Sara bi sedan, bi hezaran Sara tev lê bûn. Hevala Sara niha ne li cem me ye, lê ew bi enerjîya xwe her tim bi me re ye. Ew di her keliyê de hêze dide me. Ji ber vê yekê, erka me ye ku em komkujiyê lanet bikin û pûç bikin."



Jinên şoreşger hatin bibîranîn

Endamên Têvgera Jinên Azad (TJA) li avahiya DBP a li navçeya Peyas a Amedê li hev civiyên û siyasetmedarên Kurd Sakîne Cansîz, Fidan Dogan û Leyla Şaylamez ên 9'ê Çileyê 2013'an li Parîsê hatin kuştin û Sêvê Demîr, Pakîze Nayîr û Fatma Uyar ên ku di 5'ê Çileyê 2016'an de li Sîlopiyayê hatin kuştin, bibîr anîn.

Aktivîsta TJA'yê Arzu

Akşahî di merasîna bîranînê de axivî û wiha got "Her çiqasî ku li ser komkujiya Parîsê re 4 sal derbas bûne jî hej ne hatiye ronîkirin.

Di heman demê de bi mirina bi guman a kujer Omer Guney, ev tîkîlî û hêzên tarî hatin nixumandin." Akşahî da xuyakirin ku ji ber ku Sêvê, Fatma û Pakîze li hemberî polîtîkayên şer derketin hatin

qetilkirin û wiha got: "Bi kuştina siyasetmedarên jin xwestine dengê hemû jinan bibirin."

Akşahî destnîşan kir ku ew ê li ser şopa van siyasetmedar û şoreşgeran bin û heta aşî pêk were, ew ê tîbîkoşîn û hesab bipirsin. TJK-E jî bi heman armancê daxuyaniya da û wiha got: "Lêgerîna û hewldanên me yê ji bo ronîkirina komkujiya Parîsê dê bidome." ANF

Divê rastiya Komkujiya Parîsê aşkera bibe

TÊKOŞERÊN KURD Sakîne Cansîz, Fidan Dogan û Leyla Şaylamez di 9'ê Çileyê 2013'an de hatin şehîdkirin. Lê tevî ku hat xwestin ku encama lêkolînê ku der barê komkujiyê de hatin kirin, werin aşkerakirin jî hikumeta Fransayê bê deng ma û rastiya vê bûyerê veşart. Li gorî agahiyên çape-menîya Almaniyayê di sala 2016'an de dan, Hikumeta Almaniyayê jî milîsekî tirk ku plan dikir siyasetmedarekî kurd li Almaniyayê şehîd bixe, girtiye.

Endama Koordînatona Kongreya Star a Kantona Kobanê Sara Xelîl der barê çaremîn salvegera komkujiya Parîsê de axivî û da zanîn ku Sakîne yekem jina ku li gel Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan têkoşîn kiriye û ji bo azadiya jinan şer kiriye. Sara Xelîl got ku dema navê Sakîne tê bihistin mînaka jina berxwedêr di mejiyê mirovan re derbas dibe. Xelîl Sara destnîşan kir ku Sakîne Cansîz û hevalên xwe bi destê dewleta tirk hatin şehîdxistin û destnîşan kir ku divê kujer bê darizandin û divê jinên kurd şopdarên rêya Sakîne bin. Endama Dîwana Dada Civakî ya Kantona Kobanê Şêrîn Xelîl jî diyar kir ku komkujiya Parîsê komployeke navneteweyî bû û ev tişt got:

"Tirkîyeyê bi kiriyarên bi vî rengî hewl dide jina durrî azadiyê bixe û wê kole bihêle. Lê jina kurd bi têkoşîna xwe da ser rêya şehîdan û hebûna xwe îspat kir." Şêrîn di dawîya axaftina xwe de bang li rêxistinên navneteweyî yê ku mafên jinan diparêzin kir ku li hember vî komkujiyê bêdeng nemînin û ev tişt anî ziman: "Sakîne û hevalên wê nimûneya berxwedana jina azad e." KOBANÊ - ANHA

Jinên şoreşger bûn pira têkoşinê

Yekitiya Jinên Sosyalîst a Fransayê tîkildarî qetilkirina sê jinên şoreşger Sakîne Cansîz, Fidan Dogan û Leyla Şaylamez ku li Parîsê hatibûn qetilkirin, daxuyaniyeke nivîskî da. Yekitiya Jinên Şoreşger destnîşan kir ku ew bûne nûnerên têkoşîna azadiya jinan ya ku mezin dibe û bûne pira pêşeroj û paşerojê û wiha hat gotin: "Di salvegera 4'ê emîn ya komkujiya Parîsê de daxwaza meya edaletê berdewam dike. Lê belê ev edaleta pêk ne hatiye û bîrper jî hej ne hatine dazendin. Dixwazîn bi mirina guman ya tetîkêş Omer Guney ser dozê bigirin ev yek jî hêrsa me mezin dike. Lê belê em ê destûr nedin ku ev doz bêgirtin û em ê şopdarên vî dozê bin."

Jinên Sosyalîst destnîşan kir ku Erdogan û hikumeta AKP'ê dixwaze li Kurdistan û Tirkîyeyê bi perçiqandîne gel testîm bigire û AKP dixwaze komkujiyên ku bi destê DAİŞ'ê pêk tên normal bike û mafê gel yê hatîna gel hev jî jî holê rabike. Yekitiya Jinên Sosyalîst da zanîn ku bi komkujiya Parîsê re azadiya gelê kurd û hişyarbûna jinan hedef hatiye girtin lê divê were zanîn ku abîde û sembola têkoşîna jinan Sakîne, Fidan, Leyla, Yelîz, Şîrîn, Sêvê, Pakîze, Fatma, Gunay, Dîlek, Dîlan, Ekin in û herî dawî bang li hemû jinên koçber ên li Ewropayê kir ku di 7'ê çileyê de li Parîsê li hev bicivin. PARİS - ANF



Ji HPG'ê bîlançooya 2016'an

HPG'ê bîlançooya şerê 2016'an aşkera kir. HPG'ê got ku di şerê 2016'an de 38 jê bi rûtbe, 3404 leşker û polîs hatin kuştin û wiha hat gotin: "1 balafira şer a F-16, 3 helikoptêr û 8 tang, 166 wesayitên zirxî hatin rûxandin û 585 gerîla jî şehîd bûn."

Navenda Ragihandina Çapemeniyê ya HPG'ê bîlançooya şerê 2016'an ragihand. HPG'ê diyar kir ku wan wek HPG li dijî êrîşên metîngeriyê yê bi plana qirkirin û bi temamî tunekirinê, şerê berxwedanê mezin kiriye. HPG'ê da zanîn ku şerê ku mehên pêşîn şerê li Amedê

geş bû, li Botan, Dêrsim, Serhat û Amanosan belav bû û wiha hat gotin: "Di vê şerê mezin de dewleta tirk windahiye herî zêde di şerê 2016'an de dane. Operasyonên ku bi hezaran leşker û çekên giran ên ku bi teknîka pêsketî bi rê ve dibirin, ji ber sedema ku win-

dahiye giran didan, neçar hatine hiştin ku piştî demeke kurt vekişin. Bi vî awayî di şerê gerîla de ku bi awayekî profesyonel tê birêvebirin, hêzên dijmin têk birine." HPG'ê destnîşan kir ku sala 2016'an, di şerê berxwedanê de bi sedan hevrêyên wan ên wekî Azad

Siser, Devrîm Amed lehengiyên destanî ava kirine û di xeta fedaî a Apoyî de tê koşiyane û ev tişt hat ragihandin: "Em hemû hevrêyên xwe yê ku ji bo parastina nîrxên gelê me biparêzin şehîd bûn û hemû welatparêzên ku jiyana xwe ji dest da, bi hurmet û bi minet bi bîrtînin, em encamên şerê 2016'an bi gelê xwe re û raya giştî re parve dikin."

LEŞKER WINDA NE

Beriya çend rojan artêşa tirk bîlançooyek têkildarî yekûna leşkerên xwe weşand. Tiştê balkêş ew e ku hejmara serfermandariyê û hejmara çavkaniyên biyanî ya meha kanûna 2016'an hev nagirin. Li gel leşkerên girtî, ixraçkirî, firarî û kuştî 18 hezar leşkerên tirk winda ne. **BEHDÎNAN - ANF**

Bîlançooya şer

ÊRÎŞ Û OPERASYONÊN ku dewleta tirk pêk anîn;
Operasyonên bejahiyê: 323
Êrîşên bi balafirên şer: 406
Êrîşên helikoptêrên Kobra: 88
Êrîşên hewan, obus, tang û topan: 493
Li dijî êrîş û operasyonan çalakiyên hêzên me yê gerîla;
Çalakî û şer: 1150 (160 jê çalakî ne)
Leşkerên ku hatin kuştin (polîs, leşker) : 3404 (38 jê bi rutbe ne)
Hejmara leşkerên birîndarbûyî: 1334
Wesayitên zirxî yê ku hatine rûxandin: 166 (8 jê tang in)
Wesayitên zirxî yê ku derb xwarin: 48
Helikoptêr û balafirên şer ên ku hatine îmhakirin: 4 (1 jê balafira şer F-16)
Helikoptêrên ku derb xwarin: 25 (14 jê Skorsky, 11 jê helikoptêrên Kobra)
Çalakiyên ku encamên wan diyar nebûn: 286
Gerîlayên ku şehîd bûn: 585 (13 gerîlayên me di şerê berxwedana Şengalê de şehîd bûn)
Gerîlayên diltgirtî: 14

Pêkutî derketine asta herî jor

Li Mêrsînê, di operasyonên li dijî HDP'ê de bi dehan kesên hatin binçavkirin û paşê hatin girtin, hefteya borî birin Girtîgeha Mêrsînê. Girtiyên di hevdîtina bi parêzerên xwe re de ragihand ku ew rastî îşkenceyê û muameleya kêfî ya girtîgehê tî. Parêzer Sebhat Gençtarîh Cebe ya ji bo hevdîtina bi muwekilên xwe çû girtîgehê, anî ziman ku muwekilên wê bi wan re hevdîtin pêk anîne, porê hemûyan hatibû jêkirin û wiha axivî: "Dema me pirsî, em hîn bûn ku bi zorê porê hemûyan li 3 numareyan xistine. Her wiha em hîn bûn ku girtiyên roja ewil bi hev re birine ji ber ku li nîzamiya leşkerî hejmar nedane, bi awayî fecî rastî lêdanê û derbkirinê hatine û ew sewqî nexweşxaneyê nekirine." Cebe da zanîn ku ew pêkanî ne qanûnî ne, ji derveyî qanûnê ne. Cebe destnîşan kir ku girtî mane li ber însafa gardiyanan. Parêzer Alî Bozan ji da zanîn ku muwekilên wî yê li girtîgeha



Mêrsînê jî hatine derbkirin. Bozan diyar kir ku odayên girtî lê dimînin 3 kesî ne, lê belê 8 kes li odayekê tî ragirtin.

Şaxa ÎHD a Mêrsînê jî têkildarî bînpêkirinê mafan ên li Girtîgeha Tîpa C a Jinan a Tarsûsê raporek amade kir. Di rapora hat amadekirin de, ji bo pêdiviya germkirinê ya girtiyên, serê her girtiyekî êzingek tê dayîn û wiha hat gotin: "Li Girtîgeha Tarsûsa Mêrsînê ya ku jin lê tî ragirtin, li odayên 40 kesî 85 kes tî ragirtin. Ji ber ava

şebekeyê ya li odayên girtîgehê nayê vexwarin, rojê du caran bi satilan av tê kişandin. Heke av tîr neke, careke din nayê û girtî bê av tî hiştin. Ji aliyê îdareya girtîgehê ve, ji bo pêdiviyên zarûrî yê girtiyên ên wek serşuştinê, ava germ û xwegermkirinê serê kesekî tenê êzingek tê dayîn." ÎHD'ê her wiha destnîşan kir ku pêdiviyên tenduristiye jî nayên bicihanîn û li girtîgehê wergera kurdî tune ye û nameyên bi kurdî dinivîsin jî nayên şandin. **MÊRSÎN - DÎHABER**

ÎHD: Girtîgeh kirin malên mirinê

ŞAXA KOMELEYA Mafên Mirovan (ÎHD) ya Îzmîrê têkildarî zextên li ser girtiyên ên herêma Egeyê rapor amade kir. Li gorî raporê mafê girtiyên e ragihandinê, tenduristiye, starê jî destê wan hatiye girtin. Dîsa girtî rastî lêdan, muameleya xerab û tundiya diwar tî. Li girtîgehên Kiriklar, Şakran, Manîsa, Odemiş, Soke Gullubahçe û Menemenê li gorî dane û çavdêriyan piştî darbeya 15'ê tîrmehê girtî sewqî girtîgehên din tî kirin. Dema tî sewqî kirin jî rastî

lêdanê tî. Mafê girtiyên e hevdîtina vekirî ji saetekê daxistine 40 deqîqeyan. Mafê girtiyên e telefonê jî 10 deqîqeyan kêmtir kirine û di bin qeydan de hevdîtin dikin. Rêveberê Şaxa ÎHD'ê ya Îzmîrê Ahmet Çiçek der barê bînpêkirinê mafan ên li girtîgehên herêma Egeyê de agahiye girîng parve kirin. Çiçek anî ziman ku bi îlana OHAL'ê re girtîgeh bûne malên mirinê û wiha got: "Li girtîgehan bi sedan girtiyên nexweş li ber mirinê ne. Lê

mixabin hemû cemawerî û dewlet temaşe dikin. Çiçek anî ziman ku rayedarên girtîgehê jî bo her tiştî girtekan amade dikin û cezayê hucreyê li wan dibirin. Çiçek da zanîn ku mafê parastinê jî destê girtiyên hatiye girtin û ev tişt anî ziman: "Girtiyên nexweş dema dibin nexweşxaneyê destê wan li pişt wan kelepçe dikin. Girtiyên vî yekê qebûl nakin jî wan derman nakin û rastî tundiye tî. Girtîgeh bûne malên mirinê." **İZMİR - DÎHABER**



Navê Êrîşkar Lakhe ye

Navê Êrîşkarê li navenda şahiyê Reina ya Ortakoya Stenbolê Êrîş pêk anî û 39 kes kuştin û 65 kes jî birîndar kirin, hat aşkerakirin. Li gorî nûçeya TRT Worldê, navê Êrîşkarê ku li ser nîfûsa Kirgîzîstanê qeydkirî ye, "Lakhe Mashrapov" e. Têkildarî Êrîşê 14 kes hatibûn binçavkirin. Duh jî hevsera Êrîşkar hat binçavkirin. Her wiha dermankirina 32 kesên di Êrîşa Reinayê de birîndar bûne jî berdewam dike. **STENBOL**



Atolyeya jineolojiyê dest pê kir

Atolyeyên jineolojiya wek zanista "jiyan û jinan" tê pênasîkirin, didomin. Li Îzmîrê, dewreya duyemîn a atolyeya jineolojiyê bi pêşengiya Teverga Jinên Azad, li avahiya HDP'ê a Karşiyakê dest pê kir. Jin, her hefte roja yekşemê li atolyeya jineolojiyê tî gel hev û li dijî tehekuma zanista serdest a mîran, nîqaşên zanista jinan dikin. Berdevka atolyeya jineolojiyê Maîle Arîç, têkildarî xebatên atolyeyê agahî dan û diyar kir ku jineolojî di warê lêpîrsîna pîrsên wek ji bo çî û çawa jin ji xwezaya civakî hat qutkirin, girîng e. Arîç destnîşan kir ku ji ber wê difikirin divê zanistek ku rizgariya jinan esas digire hebe û ji ber wê wan ev atolye vekirîye. Arîç bang li hemû jinan kir ku beşdarî atolyeyê bibin û wiha got: "Beşdarbûna wan dê ji bo rizgariya jinan gaveke girîng be. Jineolojî tenê ne ji bo jinan, ji bo rizgariya civakê jî gaveke girîng e." **İZMİR**



Ji kar hat durrxistin, lê nizane bi çî tê tawanbarkirin!

Berdevka Şaxa Sendikaya Kedkarên Buroyê (BES) a Kocaeliyê Gulîzer Ateş a li Gerinendetiya Saziya Ewlehiya Civakî (SGK) dixebitî, di 27'ê kanûna 2016'an de madeyên 137 û 138'ê emîn ên qanûna 657'an wek hincet hatin nîşandan û ji peywîrê hat durrxistin. Durrxistina ji peywîrê bi awayekî nivîskî ji Ateşê re hat şandin û dibêje, tu hincetê hiqûqî ya durrxistina wê ya ji kar tune ye, lê bes bi temamî ji ber faalîyetên wê yê sendikayî ye. Ateş destnîşan kir ku ew dixwaze mafê xwe yê bersivê, parastinê bi kar bîne, ji bo ku ew bizane bê ka bi çî tê tawanbarkirin. Ateş got ku ew difikire ku ew ji ber faalîyetên sendikayê ji kar hatiye avêtin û got ku ger keddâyîn sîc be, ew ê sîcê mafê parastina kedkaran kiriye. Ateş destnîşan kir ku durrxistina wê ji peywîrê nayê wateya ku ew ê têkoşîna xwe nedomîne û got ku heke ew tê bikoşin, dê bi ser bikevin. **KOCAELİ**



Dê ji bo Rozerîn serî li DMME'yê bidin

Rozerîn Kalkan piştî ku ji girtîgeha Mêrdînê ya Tîpa E hat girtin li Girtîgeha Nîgdeyê ya Tîpa E di hucreya yekesî de tî hiştin. Ji bo Kalkan a 19 salî ku piştî hat binçavkirin bi îşkenceya zayendî re rû bi rû ma û bi darê zorê pê îfade dan îmzekirin, hemû dilekçe û îtirazên ku ji bo wê hatin kirin ji aliyê dadgehê ve hatin

redkirin. Parêzer Metîn Gun e ku bi Kalkan re hevdîtin kir, diyar kir ku piştî ku Kalkan şandine Nîgdeyê du caran pê re hevdîtin kirine û wiha got: "Rozerîn ji ber ku bi FETO'yîyan re naxwaze bimîne di hucreya yekesî de tî hiştin. Hucreya ku Kalkan tî de dimîne jî lampeya wê 24 saetan vekirî ye û ev jî îşkenceyeke pîskolojîk

e û rojê du caran li hucreya wê lêgerîn tî kirin. Bi girtiyên edlî re derdikeve heman hewşê." Parêzer Gun destnîşan kir ku ji bo Kalkan serî li gelek rêyên hiqûqî dane lê encam negirtine û da zanîn ku rê hemû hatine girtin loma ew ê serî li Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê (DMME) bidin. **MÊRDÎN - ŞÛJIN**

DI ROJNAMEYA SPIEGEL ONLINE ya ku li ser internetê weşanê dike de bi ser navê Tirsaw Ewropayê ya Polîtîkaya Rojhilat a Erdogan' rewşa Tirkiyeyê ya dawîn hat nixandî. Di nivîsê de şerê li Kurdistanê tê bibîrxistin û tê gotin ku ji ber polîtîkayên serokomar Recep Tayîp Erdogan rewşa aboriya Tirkiyeyê ne baş e. Di nivîsê de ji bo vê rewşê gotinên Erdogan ên mîna 'Em di şerê nû yê rizgariyê de ye' wek delîl tên nîşandan. Di berdewama nivîsê de bûyera şeva sersalê ya li Reyên jî tê bibîrxistin û tê ragihandin ku têkiliya bûyerê bi aloziyên di navbera hêzên sekuler û oldar re heye. Di nivîsê de piştî vê tespîtê tê destnîşankirin ku dê aloziyên di navbera AKP'ê û mirovên sekuler de zêde bibin. Di nivîsê de hat diyarkirin ku di aliyê berjewendiyên aborî û têkoşina li dijî terorê de pêwistiya Tirkiyeyê bi Ewropayê heye. **AMED**



Şebekeya derbaskirina çeteyan

Şebekeyên taybet ên ku bi piştgiriya AKP'ê hatine avakirin bi armanca êrîşan pêk bînin çeteyên DAIŞ'ê derbasî Ewropayê dîkin. Hat îdiakirin ku herî dawî şebekeyê 4 çeteyên DAIŞ'ê derbasî Almaniyayê kirine



Li Almaniyayê çeteyek hat girtin

Li bajarê Saarbrückenê yê Almaniyayê kesekî ku plan dikir şeva sersalê li ser navê DAIŞ'ê êrîşekê pêk bîne, hat girtin. Kesê ku ji aliyê polisên alman ve hat girtin ji polisên re ragihand ku ji bo debara malbata xwe ji Sûriyeyê hatiye û bi armanca ku ji DAIŞ'ê alîkariya aborî bigire serî li planeke wiha daye. **SAARBRÜCKEN**

Netanyahu pirsên bertîlê bersivandin

Serokwezîrê Îsraîlê Benyamîn Netanyahu ji ber lêpîrsîneke bertîlê ku der barê wî de hatibû vekirin 3 saet îfade da polisên Îsraîlê. Berdevkê hêza taybet a polisên der barê lêpîrsîne de daxuyaniyek da û ragihand ku polisên Îsraîlê Netanyahu li mala wî ya Qudsê xistine lêpîrsîne û pirsên bertîlgirtinê jê kirine. **TEL AVIV**

Salê bi şewitandina wesayîtan dest pê kir

Şeva sersalê li gelemperiyê Fransayê 650 wesayît hatin şewitandin. Wezareta Karên Hundir a Fransayê der barê şewitandina wesayîtan de daxuyaniyek da û diyar kir ku her çî qas çalakiya şewitandina wesayîtan neyê qebûl kirin jî ev berdewam dike. Di sersala par de jî bi heman rengî li Fransayê 602 wesayît hatibûn şewitandin. **PARÎS**

Gelek girtiyan jiyana xwe ji dest da

Li Girtîgeha Anísio Jobim a li bajarê Manaús a girêdayî Parêzgeha Amzonasê ya Brezilyayê di navbera girtiyan de şer derket. Di encama şer de li girtîgehê 60 girtiyan jiyana xwe ji dest da. Hat diyarkirin di navbera girtiyan de ji ber lihevnekirinê şer derketiye. Li aliyê din 12 gardiyan jî li girtîgehê ji aliyê girtiyan ve hatine dîlgirtin. **MANAÓS**

Daxwaza serxwebûnê nehat qebûl kirin

Serlêdana ji bo refrandûma serxwebûna parêzgeha Bavyerayê ya Almaniyayê hat kirin, ji aliyê Dadgeha Destûra Bingehîn a Federal ve hat redkirin. Dadgehê jî ber daxwaza veqetîna ji Almaniyayê li dijî pergala destûra bingehîn e, serlêdana ji bo refrandûma serxwebûnê layiqê nixandîne nedît û serlêdan red kir. **KARLSRUHE**

Rojnameya Ozgur Politika ya ku li Ewropayê weşanê dike der barê derbaskirina çeteyên DAIŞ'ê ya Ewropayê de nuçeyek girîng û balkêş weşand. Desthilatdariya AKP'ê ya ku ji bo dijminahiya xwe ya li dijî kurdan piştigirî dide çeteyên DAIŞ'ê û El Nûsrayê, derket holê ku ji bo derbaskirina çeteyan a Ewropayê ji şebekeyên taybet ava kirine.

ÇETEYAN DIŞÛNIN

Şebekeyeke taybet ku bi piştigiriya AKP'ê hatiye avakirin, di kanûna 2016'an de 4 çeteyên DAIŞ'ê ji Mûsilê anîne û di ser Yewnanistanê re bi armanca

ku êrîşan pêk bînin, derbasî Almaniyayê kiriye. Rêxistina îstîxbaratê ya Awusturyayê endamekî şebekeyên taybet ên çeteyan tînin Ewropayê girt û xist lêpîrsîne.

Endamê şebekeyê agahiyên balkêş dan rêxistina îstîxbaratê ya Awusturyayê û aşkera kir ku ew di ser Yewnanistanê re çeteyan ji Tirkiyeyê dişînin Ewropayê û herî dawî 4 çeteyên DAIŞ'ê yên bi navê Ahmed H., Radad A., Easser B. û Satar A. ji Mûsilê anîne Tirkiyeyê û bi armanca ku êrîşan pêk bînin şandine Almaniyayê.

Rêxistina îstîxbaratê ya

Awusturyayê piştî van agahiyên, rayadarên alman der barê mijarê de hişyar kirin. Li Tirkiyeyê gelek şebekeyên ku qasibgeriya mirovan dîkin hene. Lê cara yekemîn e ku şebekeyek ji bo derbaskirina çeteyan a Ewropayê hatiye avakirin.

PASAPORTÊN SEXTÊ

Endamê şebekeyê yê ku nasnameya wî veşartî hat girtin, ragihand ku wan ji bo derbaskirina hin çeteyên din pasaportên 4 çeteyên derbasî Almaniyayê kirine careke din şandine Tirkiyeyê.

Li gel van belge û agahiyên ku hatin bidestxistin jî, Daîreya

Krîmînal a Federal (BKA) ragihand ku ew ji derbasbûna 4 çeteyên DAIŞ'ê ya Almaniyayê ne agahdar in. Daîreya Krîmînal a Federal ji ber êrîşa li dijî bazara Noelê ya li paytext Berlinê gelekî hat rexnekirin.

ŞANDIN YEMENÊ JÎ

Her wiha Rayedarê Îstîxbarata Yemenê General Mûhammed Enver Mahmûd Beşerî jî diyar kir ku 157 çeteyên DAIŞ'ê û El Qaîdeyê di çarçoveya peymanê veşartî ya di navbera Erebestana Siûdî, Tirkiye û Mansûr El Hadî de bi balafirêke Tirkiyeyê hatine balafirxaneya Adenê. **AMED**



Peymana agirbestê têk çû

Peymana agirbestê ya ku piştî têkçûna çeteyên Koalîsyona Niştîmanî ya li Helebê, bi garantoriya Rûsya û Tirkiyeyê di navbera rejîma Baasê û muxalîfan de hat mohrkirin hilweşiya. Rejîma Baasê ya ku piştî peymanê gelek caran ragihand ku ew bi garantoriya Tirkiyeyê ne bawer in, êrîşên xwe yên li dijî çeteyên

Koalîsyona Niştîmanî yên ku piştigiriya xwe ji Tirkiyeyê digirin, qet ranewestand.

Çeteyên ku di encama êrîşên rejîma Baasê de li Şam û Humîsê gelek windahî dan, duh ragihand ku heta êrîşên rejîmê yên li dijî wan neyên rawestandin xwe ji peymanê vedikişînin û tev li hevdiîtinên Astanayê nabin.

Di roja çaran a agirbestê de 10 komên çeteyên girêdayî Artêşa Sûriyeya Azad û Koalîsyona Niştîmanî ragihand ku rejîma Baasê agirbestê bînpê dike û ji ber vê yekê ew heta êrîşên rejîmê yên li dijî wan ranewestandin de tev li hevdiîtinên Astanayê nabin. **AMED**

Daxwaza lihevnekirinê ji Trump kirin

Bi dehan zanyarên amerîkî ji serokê ayende yê Amerîkayê Donald Trump xwest ku piştî dest bi peywira xwe bike, peyman nukleerî ya di 2015'an de bi Îranê re hatiye mohrkirin berdewam bike. Trump di dema kampanyaya xwe ya hîlbijartinê de soz dabû ku dema bibe serokê Amerîkayê peyman nukleerî ya bi Îranê re hatiye mohrkirin, dê betal bike.

Di van rojan de ku li bendê ye Trump bi awayekî fermî dest bi peywira xwe bike,



zanyarên amerîkî pên-gaveke girîng dan destpêkirin. Gelek

kesên xwediyê Xelata Nobelê, şewirmendên zanistî yên berê û pisporên çekên nukleerî jî di nav de, 37 zanyarên amerîkî ji Trump re nameyek nivîsand û jê xwest ku peyman nukleerî ya bi Îranê re hatiye mohrkirin, bidomîne.

Li gorî peymanê di sala 2015'an de bi Îranê re hate çekirin, dê ji sedî 95'ê çavkaniyên ûranyûma dewlemendkirî di bin çavdêriya Neteweyên Yekbûyî de were îmhakirin. Di berdêla vê yekê de jî ambargoyên aborîyê yên li ser Îranê qonax bi qonax tên rakirin. Her wiha blokaja li ser 100 milyar dolarên Îranê yên li derveyî welat, hatibû rakirin. **NEW YORK**

Helîkoptera leşkerî wînda bû

Li Venezûelayê helîkoptereke leşkerî ku 13 kes tê de bûn li herêma daristanên Amazonê wînda bû. Wezîrê Ragihandinê yê Venezûelayê Ernesto Villegas der barê windabûna helîkopterê de daxuyaniyek da. Wezîr Villegas ragihand ku balafira windabûyî ya artêşa Venezûelayê ye û wiha got: "Ji bo lêgerîn û rizgarkirina helîkopterê bi 8 balafirên keşê xebat hatiye destpêkirin." Villegas der barê kesên di helîkopterê de tu agahî nedan. Li gorî agahiyên di çapemeniya Venezûelayê de di helîkopterê de 5 jê sivil 13 kes hebûne. **CARACAS**



Artêşa tirk sê sivîl qetil kirin



Artêşa tirk a dagirker duh saet di 13.00'an de ji gundê Şêx Nasir bajarka Erîma ya ku dikeve rojavayê bajarê Minbicê topbaran kir. Di encama topbaran artêşa tirk de 3 welatîyên sivîl jiyana xwe ji dest dan û 15 kes jî bi giranî birîndar bûn. Her wiha birîndaran jî bo dermankirinê rakirin nexweşxaneyên Berkel û Tişrin ên bajarê Minbicê. **MINBIC**

Ji ber mayîna çeteyan ji pêyên xwe bû

Ciwanê bi navê Edhem Xelîl (18) yê ji Girê Spî dema pezê xwe li gundê El-Sofiya yê diçêrand, pêl mayîna ku berê çeteyên DAIS'ê bin ax kiribûn, kir. Di encama teqîna mayîna de Xelîl her du piyên xwe winda kir. Xelîl rakirin nexweşxaneyê Girê Spî û niha li wir tê dermankirin. **GIRÊ SPI**

Ji ber kiryarên Tirkiyeyê ava Efrînê qirêjî bû



Bendava Meydankê 12 kîlometereyan dikeve bakurê Efrînê û li ser çemê Efrînê ye, ava wê jî bakurê Kurdistanê tê. Ava bendavê jî bo çandîni û vexwarinê baş e. Şirketên ava vexwarinê piştî ku avê paqij dikin digihîne navenda kantonê û gundê derdorê. Her wiha ava bendava Meydankê di 27'ê kanûna 2016'an de ji ber kombûna heriyê din av boriyan de qirêjî bû û bû sedem ku av li ser kantonê were qutkirin. Der barê mijarê de hevseroka şaredariya Gel a kantonê Efrînê Rozelîn Umer diyar kir ku dewleta tirk bi zanebûnê ava li ser Efrînê qut kiriyê û paşê jî nû ve careke din berdaye û ev jî bûye sedema kombûna heriyê din av boriyan. Umer destnîşan kir ku ew amadekariyên kolandina 9 bîran dikin da ku ew pirsgerêk bê çareserîkirin û ji welatîyan xwest ku avê zêde xerc nekin. **EFRÎN**

Welatî rêyên Reqqayê bi daran dixemilînin

Bi operasyona Xezeba Firatê, Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) rêyên Reqqayê vekir û niha reqqayîyên hatine rizgarkirin jî heman rêyan dixemilînin. Welatîyên der du aliyên rêyan bi darên diçikînin dixemilînin anîn ziman ku ew niha bajarên xwe yê azad bûye xweşik dikin û dikin warê jiyane. Welatîyan diyar kir ku piştî ew ji çeteyên DAIS'ê rizgar bûne ji nû ve jiyane hembêz kirine û destnîşan kirin ku ji ber vê yekê niha ew hawirdora xwe bi daran rengîn dikin û wiha gotin: "Em li seranserê xeta hatiye rizgarkirin daran biçikînin. Dê ev bibe nişaneyê azadiya me." **REQQA**

Şervanê YPG'ê Egîd Dilgeş hat oxirkirin

Bi hezaran cenazeyê şervanê YPG'ê Egîd Dilgeş spartin axê Li bajarê Heseke bi hezaran kes cenazeyê şervanê YPG'ê Setam Osman (Egîd Dilgeş) ê di 29'ê kanûna 2016'an de li gundê Malhayê şehîd bû bi merasîmekê spartin axê. Beriya spartina cenazeyên endamê fermandariya YPG'ê Lewend Rojava axivî û got ku hêzên YPG'ê ji destpêka şoreşa Rojava xwe kirin mertal û bersiva hemû komên çete dan. Rojava her wiha da zanîn ku Şehîd Egîd yek ji şervanên YPG'ê yê canê



xwe di rêya azadiyê de dane û wiha dom kir: DDê hevalên şehîd Egîd ku di qadên şer de ber xwe didin tola wî hilînin. Şoreşa Rojava hêza xwe ji

qadên şer girtiye û em rê nadin tu aliyan ku bi nixên gel û şehîdan bilîzin. Em soza xwe dubare dikin ku em ê heta dawiyê şopdarên rêya şehîdan û xeta Rêberê Gelê Kurd Abduhal Ocalan bin. Piştî axaftinan gel cenazeyê şehîd Egîd Dilgeş bi dirûşmeyan spartin axê. Her wiha Meclisa Malbatên Şehîdan ji bo bîranîna 41 cangoriyên ku di salên cuda de şehîd bûne li goristana Şehîd Dilşêr a li gundê Dugirê ya Tirbespiyê merasîmek li dar xist. **ANHA**

Çareserî Federalîya Demokratîk e

Nivîskar û Lêkolîner Dana Celal da zanîn ku belgeya siyasî ya Meclisa Damezirîner ji bo gelê Sûriyeyê serkeftinek e û her wiha got ku ji bo aloziyên Rojhilata Navîn jî çareserî ye

CÎHAD ROJ / ANHA

Nivîskar û Lêkolînerê kurdistanî Dana Celal der barê belgeya siyasî ya Meclisa Damezirîner a Sîstema Federalîya Bakurê Sûriyeyê de axivî û anî ziman ku belgeya siyasî ji bo gelê Sûriyeyê serkeftinek e û armançên Şoreşa Rojava pêk tîne.

Celal diyar kir ku navaroka belgeyê piştî têkçûna bihara gelan nêrînen şoreşê derdixe pêş û got ku di hundirê belgeyê de demokratîkbûyîn heye. Celal destnîşan kir ku belge bi bendên xwe yê siyasî tegehên hevbeşîya aborî, siyasî, wêkhevî di aliyê belavkirina berhem û desthiltdarî de bi pêş dixê û ev tişt anî ziman: "Her wiha di navbera jin û mîran de wêkhevîyê xurt dike. Ji bilî vê yekê belge projeya çareserîya federalîya jeografîk dûtî sistema netewedewletê pêşniyar dike."

Celal daxuyand ku federalîya



xaknigarî navê 'Rojava' jî di nav xwe de diparêze û wiha domand: "Em dikarin wê yekê wekî serkeftinekê mezin bi nav bikin. Ji ber ku wê pirsgerêka girêdana kantonê Kobanê û Efrînê çareser bike. Piştî demêke jî belavbûna fikrê radikal û nijadperestê ew belge ji bo gelê Sûriyeyê serkeftinekê mezin e. Ev belge bingeha Sûriyeyê wekî welatekî yekgirtî diparêze. Sernavê sereke yê wê

hevpeymanê hewldana rakirina sîstema netewedewlet, nijadperest û qanûnên wê radîke û demokratîkbûnê ava dike."

Celal destnîşan kir ku belgeya siyasî têgînên nû wekî welat, dewlet, sîstema siyasî, civakî û aborî pêşniyarê Rojhilata Navîn dike û wiha got: "Fikrê şoreşa Sûriyeyê ku ji aliyê rêxistinên terorîst ve ji wateya wê hatibû duxistin vedigerîne fikrê wê yê durist."

Her wiha Celal der barê projeyên din ên ku ji bo çareserîya Sûriyeyê hatine pêşniyar kirin jî ev tişt anî ziman: "Projeya rejîma Baasê desthiltdarî, zilm û nijadperestî dide pêş. Projeya muxalefetên ku girêdayî Tirkiyeyê ne dixwazin Sûriyeyê perçe û lewaz bikin. Her wiha heta niha tu çareseriyên demkî ji bo aloziyê nehatine peyda kirin. Lê projeya Sîstema Federalîya Demokratîk ji bo her pêkhate, ol û mezhebên Sûriyeyê hatiye amadekirin."

'Divê hemû ereb piştgiriyê bidin'

SEROKÊ NAVENDA QAHIË ya

Lêkolînê Kurdî El-Seyd Ebd El-Fetah rewşa dawiyê li Sûriyê, dagirkeriya dewleta tirk a axa Sûriyeyê û projeyên demokratîk li Bakurê Sûriyeyê nixand. Ebd El-Fetah destnîşan kir ku dewleta tirk di dîrokê de tu caran hurmet nişanî dewletên cîran nekiriyê û hewl daye xwe her tim li ser cîranên me mezin bike.

El-Fetah da xuyakirin ku dewleta tirk a dagirker bi hinceta şerê li dijî DAIS'ê li Babê komkujîyan pêk tîne û wiha got: "Em ji xwe bîr nekin ku dewleta tirk û çeteyên DAIS'ê yek in û di navbera wan de koalîsyoneke stratejîk heye. DAIS'ê planê dewleta tirk pêk tîne." El-Fetah anî ziman ku armanca dagirkerîna dewleta tirk ne şerê DAIS'ê ye û wiha domand: "Armanca wî astengkirina projeya demokratîk ku kurd li Sûriyeyê serkeftiya wê dikin e."

El-Fetah diyar kir ku ew wekî pispor hewl didin ku rastiya gelê kurd û doza wan jî her kesî re nişan bidin û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Em wekî pisporên vî karî hewl didin ku rastiya kurdan û doza wan jî her kesî re nişan bidin."

El-Fetah di berdewama axaftina xwe de bal kişad ser helwestên dewletên ereban derheqê doza kurd û ev tişt anî ziman: "Pêwîst e dewletên ereban wêneya kurdan ku sîstemên hegemonîk di zihniyeta civaka ereban de çandîye rabîkin. Kurdan bi tecrûbeyên xwe yê demokratîk li Bakurê Sûriyê xwe isbat kirin. Ji ber vê yekê jî pêwîst e dewletên ereban rasteqîna helwesta kurdan bi taybetî Bakurê Sûriyeyê fêhm bikin û destekê bidin wan."

El-Fetah di dawîya axaftina xwe de destnîşan kir ku dewleta tirk bi rêya agirbestê dixwaze rê li pêşketinê HSD'ê bigire û wiha bi dawî kir: "Lê planên dewleta tirk bi ser nakevin ji ber ku dewleteke dagirker e. HSD, YPG û YPJ'ê jî ciwanên Sûriyê ne û gel wan qebûl dike û dawîya Tirkiyeyê têk çûne." **ANF**

Niha wateya azadiyê dizanin û dijîn

SEYÎT EVRAN / MINBIC - ANF

Piştî ku di sala 2011'an de li Sûriyeyê bûyerên şerê navxweyî dest pê kir û Minbic jî aliyê komên çeteyan ve hat dagirkirin malbatên wir mecbûr man ku di bin dagirkeriya çeteyan de bijîn. Yek ji wan malbatan Akîf Eceylo bû. Eceylo piştî ku zilma DAIS'ê li ser wan zêde bû zarokên xwe şand Şamê û ew tevî xwişk û birayên xwe li Minbicê man. Lê çeteyên DAIS'ê şevêk davêjin ser mala wî û birayên wî Radvan û Ridvan û xwişka wî Zehra digirin. Piştî çend rojan çeteyan her du bira berdidin Lê Zehra bi recmê dikujin.

Ev hêrsa kuştina Zehra di dilê Eceyloyê de her diçe mezin dibe. Kurê Eceylo yê mezin Seîd jî ji bo tola meta xwe û hemû minbiciyan hilîne diçe cem şehîd Ebû Leyla û tevî hêzên Şems El Şemal dibe. Demeke kurt piştî tevlibûna Seîd pêngava rizgarkirina Minbicê dest pê dike. Piştî rizgariyê, Meclisa Leşkerî ya Minbicê û hêzên Şems El Şemal li Minbicê bi cih bû. Akîf Eceylo yê 58 salî û kurê wî yê din Ziyad jî

tev li nav hêzên Şems El Şemal bûn. Her wiha keça wî Zuke jî tevî asayîşa bajarê Minbicê bû.

Malbata Eceylo cihê xwe di nav berxwedanê de girtiye. Kurê herî mezin Seîd û Ziyad li eniyên herî giran de cihê xwe digirin û bav jî ji ber emrê xwe li biryargê wêzîfedar e. Seîd beriya niha bi du mehan li dijî êrişên dewleta tirk û çeteyên wê yê li dijî gundên Minbicê, cihê xwe di nav eniya şer de girt û ji her du lingê xwe birîdar bû. Seîd niha tedawiye dibîne û ligel vê jî dibêje 'Cihê min ne mal e cihê min eniya şer, parastina Minbic û rizgarkirina Babê ye.'

Bav Akîf Eceylo jî anî ziman ku hem rejîm hem jî çeteyên jî bilî êşê tiştêk nedaye wan û wiha got: "Ez niha li bendê me ku zarokên min ên biçûk jî mezin bibin û cihê xwe di nav refên têkoşinê de bigirin."

Her wiha malbat Eceylo destnîşan kir ku ew gotina azadiyê berê bihistine lê nizabûne tiştêk çawa ye û wiha bi dawî kirin: "Niha em baştir dizanin azadî çî ye. Ji ber ku em wê gotinê niha bi xwe dijîn."



Serdema zêrîn a bêhiqûqiyan

Wekîlên HDP'ê yê Rihayê HDP'ê Osman Baydemîr û İbrahim Ayhan têkildarî pêla binçavkirinê ya li Rihayê, ku di şibe 'Kampa Komiserhevkerinê' li meclisa Tirkîyeyê daxuyaniyek dan.

Osman Baydemîr anî ziman ku li 38 bajaran 19 hevserokên bajêr ên HDP'ê, 56 hevserokên navçeyan, bi tevahî 972 kes hatine binavçkirin û wiha got: "Serdema zêrîn a bêhiqûqiyan li Rihayê pêk tê.

Polîtîkaya "Kampa Komkirinê" ku beriya 12 rojan me anîbû rojevê hê jî berdewam dike. Beriya bi 12 rojan



210 kes binçavkirî bûn, niha hê jî 160 kes li salona sporê ya Şaredariya

Halîliye di bin çav de ne. Di nav 12 rojan de 30 mirovên nû hatine

binçavkirin. Di nav binçavkiriyên de 2 hevşaredar, 2 parêzer û ji hemû beşên civakê nûner hene."

İbrahim Ayhan da zanîn ku hemû endamên partiya wan hedef tîr girtin û wiha pê de çû: "Em di rewşeke awarte re derbas dibin. Hiqûq nîn e, demokrasi nîn e. Berê jî em tiştên wiha re hevrû bûne. Divê zanibin ku ji vê wê tu encamê nasînin. Em li bendê ne ku hevalên me yê hatine binçavkirin di demeke nêzik de derkevin pêş darazê. Divê polîtîkayên tasfiyekirinê demildest bi dawî bibin." ENQERE - ANF

Wekîlê HDP'î Pîr hat binçavkirin

PARLAMENTERÊ HDP'Ê yê Amedê Ziya Pîr beşdarî rûniştina doza parlamentera HDP'ê Nursel Aydoğan bû. Piştî bidawîbûna rûniştina dozê Pîr li ber avahiya edliyeyê ji aliyê polîsan ve hate

binçavkirin.

Bi îdiaya der barê Ziya Pîr de biryara anîna bi zorê heye Pîr li ber edliyeyê Amedê li benda biryara dozgeriyê hat rawestandî. Parlamentera Pîr di 4'ê mijdara

2016'an de jî hatibû binçavkirin û bi biryara qedexeya derketina derveyî welat hatibû berdan. Hêjayî gotinê ye ku hevserokên HDP'ê jî di nav de 12 parlamenter dîl hatine girtin. AMED - ANF



Nikarin heqê mazotê derxin

Li Tirkîyeyê krîza aborî roj bi roj mezin dibe û esnaf ji ber krîza aborî bi gazinc in. Êdî turist nayên Tirkîyeyê û duh dolar dîsa rekor şikand. Esnafên Amedê diyar kir ku sedema krîza aborî polîtîkayên şer in

BİLAL GULDEM - DEVRAN TOPTAŞ - AMED - DİHABER

Ji ber buhabûna dovîzê, her diçe li Tirkîyeyê û Kurdistanê qirîza aborî mezintir dibe. Qirîza aborî bandorek mezin li ser esnaf û karkeran dike. Duh dolar careke din rekor şikand û 3.60 TL derbastir kir.

Krîza aborî bandoreke neyînî li ser kurdistanîyan dike. Li Hala Fêkî û Sebzevan a Amedê jî esnaf û karkerên li vir dixebetin ji ber ku kar nabe û aboriya Tirkîyeyê ber bi xerabûnê ve diçe bi gazinc in.

Yek ji karkerên Halê Gokhan Aysin diyar kir ku ji ber qirîza aborî kar tune û ev li ser karê

wan bandorê dike. Aysin anî ziman ku hilberîner ji ber zerar dike pereyên hindik dide wan û wiha got: "Sedema rawestandina kar qirîza aborî ye."

Esnafê 40 salin karê komîsyonê dike Eşref Zinarî jî bi awayekî tund li dijî qirîza aborî

derket û wiha got: "Tenê sedemek vê qirîzê heye ew jî meşandîna şerê qirîzê e. Şerê qirîzê ye li Sûr, Nisêbîn û Geverê aborî tîk bir. Navnîşana hemû çareseriyên girava İmraliyê ye."

Esnafê bi navê Hacı Ulaş jî diyar kir ku ev bû nêzi mehek nikare tu karekî bike û got ku ew nikarin deynên xwe jî bidin. Ulaş da zanîn ew hatine wê rewşê pere di nav esnafan de nemaye ku ji

hev deyn bikin û got ku qirîza aborî derketiye asta herî jor lê heya hin kesan jê nîne.

Ajokarê bi navê Mucahit Avcî jî ku sefera kamyonan dike destnîşan kir ku pereyê ew qezenc dike jî nivî dide sotemeniya maşîne û bacên maşîneya xwe û got ku çî pêk tê bi serê gel û esnafan re derbas dibe. Avcî anî ziman ku gelek rojan nikarin heqê mazotê jî derxin.



Hevserokatî ji bo jinan jiyaniye

Dewleta AKP'ê di her firsendê de pergala hevserokatîyê hedef digire. Endama Meclîsa Jinan a DBP'ê Fikriye Aytîn diyar kir ku pergala hevserokatîyê ji bo jinan jiyaniye.

Fikriye Aytîn wiha axivî: "Di hilbijartînen herêmî de 103 şaredariyên ku hatin

qezencîrin, 103 hevalên jin û bi 103 hevalên zîlam, temsîliyeta wekhev pêk anî. Di esasê xwe de armanç bi du çavan li cihanê nêrîn bû. Yek bi çavên jinê yek jî bi çavên zîlam nêrîna li cihanê bû." Aytîn diyar kir ku niha 31 hevserokên jin girtî ne." AMED

5 milyon turist kêm bûn

LI GORÎ daneyan Antalya di sala 2016'an de 5 milyon turist kêm bûn. Li gorî Amîriya İdarî ya Milkan a Balafirgehan a Antalya, di sala 2015'an de 10 milyon û 875 hezar 464 turist hatin Antalya. Ev hêj mar di sala 2016'an de 4 milyon û 693 hezar û 551 turist kêm bûn û Di salela 2016'an de 6 milyon û 181 hezar û 913 turist hatin Antalyayê. ANTALYA

Rojnameger Sancili hat girtin

RIHA - Zextên li hemberî çapemeniya azad didomin. Xwediyê İmtiyazê yê rojnameya Ozgur Gundemê ku bi Biryarnameya di Hikmê Qanûnê de (KHK) hat girtin, li navçeya Akçakale ya Rihayê hatibû binçavkirin û bi SEGBİS'ê ifade da Dadgeriya Lêpirsinê ya Nobedar a Stenbolê. Piştî ifadeyê bi îdiaya "endamê rêxistinê ye" û "yekitiya dewletê xira dike" hat girtin. Ji bo ku Sancili sewqî girtîgeheke li Stenbolê bê kirin ji Midûriyeta İnfazê ya Cezayê ya Rihayê re nivîs hat nivîsandin.



Polîsan bi ser şaredariyê de girt

WAN - Li navçeya Şaxê ya Wanê polîsên AKP'ê bi ser şaredariyê de girt. Polîsan bi awayekî hemwext bi ser mala hevşaredarê Şaxê Celalettîn Bartu ya li Wanê de jî girt. Polîsan piştî ku li malê lêgerîn kirin Bartu binçav kirin. Sedema binçavkirina Bartu nehat hînbûn û birin Midûriyeta Emniyetê ya Bajar. Polîsan piştî lêgerîna li avahiya şaredariyê jî wir çûn û hate hînbûn ku gelek xebatkarên şaredariyê hatine binçavkirin.



Zimanê neyaran û Nêçîrvan(î)...

Hefteya borî me du daxuyaniyên girîng ên der barê hebûna PKK'ê ya li Şengalê de guhdarî kirin û xwendin. Daxuyaniya ewil a Serokwezîrê Herêma Federal a Başûrê Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî bû. Ya din jî ya endamê Desteya Rêveber a PKK'ê Murat Karayilan bû...

Ziman, helwest û nêrîna ku di van daxuyaniyan de hatiye nîşandan û ferqa her du bangan ji hêjayî nixandî û analîzeke kûr e.

Ën xwedî raye û erk béguman divê her gotin û daxuyaniya xwe bipivin, bikêşin û wisa bibêjin. Ka em li wan her du daxuyaniyan binêrin û analîz bikin. Lê beriya wê divê mirov li rewşa giştî ya ku Kurdistan tê de ye binêre.

Şert û mercên îroyîn li Kurdistanê

Gelê kurd li çar parçeyan rûberî êriş û hicûmên gelek mezin tê. Li başûr neyartiya DAIŞ'ê, li Rojava êrişên mezin ên Tirkîyeyê û DAIŞ'ê mil bi milê hev dimeşin. Li bakurê Kurdistanê AKP û hevkarên wê yê nû ên faşîst polîtîkayêke wisa dimeşînin ku li ser navê kurdîyê tiştêkî nehêlin. Bi vê planê dixwazin kurdan li tevahiya Bakur tune bikin. Rejîma Îranê bi Sûriye û Iraqê re di

Mihyedîn Melko

nav hevkarîyê de ye ku destkeftiyên kurdan ên li Rojava û Başûr tîk bibe ku dor neyê serkeftina kurdên Rojhilat.

Îro hewcedariya kurdan çî ye?

Demeke ku gelê kurd li çar aliyên Kurdistanê rastî êrişan tê nabe ku daxuyani û kirinên ku zîzarê didin yekitiya neteweyî ya gelê kurd, derkevin pêş. Di demeke wisa de hewcedariya kurdan a ku neyê taloqkirin 'Yekitiya Neteweyî' ye. Ji bilî yekitiyê tiştêkî nîn e ku kurdan ji van êrişên hovane yê neyaran xilas bike.

Daxuyaniyên Nêçîrvan Barzanî

Nêçîrvan Barzanî piştî çend daxuyaniyên rayedarên hikumeta tirk ên der barê hebûna PKK'ê ya li Şengalê de ji nişka ve ji rojnameyêke biyanî re axivî û got: "Lazim e PKK ji Şengalê derkeve. Heke hêzên xwe ji wir venekîşîne em ê serî li rêyên şidetê ew e ku dê şerê PKK'ê bikin. Piştî vê daxuyaniyê wezîrekî tirk jî got heke Barzanî bixwaze ew dikarin piştigiriya wî bikin.

Daxuyaniyên Murat Karayilan

Piştî daxuyaniyên Barzanî nerazîbûneke mezin ji raya giştî ya kurd û sazîyên kurdistanî bilind bû. Gelek gotin û şîrove hatin kirin. Lê daxuyaniyê herî girîng a bersivdayîne ji Murat Karayilan hat. Karayilan got: "Jixwe hevditînen me yê bi PDK'ê û hikumeta herêmî re dewam dikirin. Me biryar dabû ku hêzên xwe vekêşin. Li gel vê rastiyê jî çima birêz Barzanî tiştêkî wiha got? An haya wî ji niqaşan tune ye. An jî dixwaze çareserîya bi rêya diyalog û hevditînan xira bike. Gelo liderê kurd çawa dikare bibêje; 'em ê serî li rêbazên tundiyê bidin'. Ev tê wateya daxwaza birakujîyê."

Mirov jî van her du daxuyaniyan fêm dike ka li Kurdistanê kîjan hêz li dijî yekiti û diyaloga neteweyî ne. Dîsa pir aşkera ye ku kî bi zimanê neyaran xeber dide û kî jî bi bo rûmeta neteweyî ya gelê kurd dixwaze.

Gelo Barzanî çima wisa kir?

Li gorî çavkaniyên pêbawer haya Nêçîrvan Barzanî ji hevditînan û biryara vekîşandinê hebû. Lê wî bi daxuyaniyên xwe yê mîna gefê xwest dilê Tirkîyeyê xweş bike û imaja xwe ya li Şengalê li dijî DAIŞ'ê xira bûye vê carê li hemberî hêzeke kurd sererast bike.

Lê Nêçîrvan Barzanî jî bir dike ku daxwaza Tirkîyeyê ya dagirkirina Şengal, Mûsil û Qendîlê bi çend gotinên bêyom ên dilê Erdogan xweş bikin nayê astengkirin. Tîştê ku pêşi li neyartiya wan bigire bi tenê 'Yekitiya Neteweyî' ye.

Çareserî azadiya Ocalan e

Jinên êlihî bertek nîşanî tecrîdê dan û xwest ku demildest bi Rebêrê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re hevdîtin pêk were. Jinan da zanîn ku çareserî girêdayî azadiya Ocalan û yekitiya kurdan e

Jinên êlihî, ji bo başkirina şert û mercên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û ji bo dubare nîvengê aştiyê bê tesîskirin, banga vekirina deriyên Îmraliyê kir.

Sultan Azboy (57) anî ziman ku tekane daxwaza wan aştî ye û wiha got: “Em dixwazin dubare hevdîtin bi Ocalan re bîn kirin. Ocalan tenê aştiyê dixwaze û naxwaze êdî mirov bimirin, dayik bigirin. Em jî naxwazin tu dayik bigirin.”

Muhsine Kina (54) wiha axivî: “Em dixwazin ev sala nû, bibe sala herî xweşik, bila nebe wekî sala çûyî, nebe sala êş û kederê.” Kamile Şimşek (60) jî anî ziman ku divê dubare hevdîtin bi Ocalan re pêk bîn. Şimşek destnîşan kir ku dê ev jî bo aştiyê tiştêkî bivênevê be û wiha axivî: “Em dixwazin biçin cem Ocalan û agahiyeke xweş binin. Ne dihêlin malbata wî ne jî tu kes biçê cem wî û destûrê nadin der barê rewşa wî de

agahiyan wergirin. Ocalan aştiyê dixwaze. Eger biçûna cem Ocalan biaxiviyana dê niha cihan û welatê me di rewşeke xweştir de bûna. Heta niha wê aştî hatiba cihanê û dê ne kurd û ne jî tirk rastî komkujiyan nehatana. Em azadiya Ocalan dixwazin. Bila deriyên girava Îmraliyê vebin.”


Melihat Sarihan got, dema bi Ocalan re hevdîtin pêk anin, li maseyê rûniştin ew pir bi hêvî û kêfxweş bûbûn û wiha

bertek nîşan da: “Li dilê me hêviya aştiyê hêşîn bûbû û me digot dê tu kes nemire. Niha çi bû ku dîsa komkuji pêk tên? Çima pêvajoya aştiyê tarûmar kirin? Fêdeya vî şerî li kê heye?”

YEKITIYA KURDAN

Nuran Seçkin (55) bal kişand ser yekitiya kurdan û wiha got: “Em ê niha çi bikin, em ê biçin cem kê? Berpirsiyarê vî şerî û vî komkujiyê hûn in. Ji bo aştiyê em azadiya Ocalan dixwazin. Divê em hemû kurd dest bidin hev û bi hev re dawî li vî şerî binin. Li vir banga yekitiyê li hemû kurdên cihanê dikim. Werin em bibin yek.”

Elif Tuluktemur (46) diyar kir ku ew hêvî dikin ve sala nû bibe sala aştî û azadiyê û wiha axivî: “Heta yekitiya kurdan pêk neyê tu çareserî pêk nayên. Dema me dest da hev û em bûn yek, dê her tişt xweşiktir bibe. Li gel ew qas ciwanên me yên mirî, çima hîn jî em nabin yek û dest nadin destê hev. Dema me dest da hev dê aştî û çareserî bê.” **ÊLIH**



Serlêdan hat redkirin

MALBATA Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji bo ku biçê girava Îmraliyê û hevdîtinê pêk bîne serlêdan kir. Serlêdana malbata Ocalan a li Serdozgeriya Komarê ya Bursayê ji aliyê dadgeriyê ve bi hinceta Rewşa Awarte (OHAL) hat redkirin. Serlêdana yekemîn serlêdana hevdîtinê ya 2017'an bû. Ji sala 2011'an vir ve hevdîtinê Ocalan a bi parêzeran re tê astengkirin. **STENBOL**

Yildirim li xwe mikur hat

Serokwezîrê tirk Binalî Yıldırım, di civîna koma AKP'ê de axivî. Binalî Yıldırım li xwe mikur hat ku bi guhertina makeqanûnê dê rejîmê biguherînin.

Binalî Yıldırım têkildarî guhertina qanûna bingehîn wiha got: “Guhertina rejîmê di sala 1923'yan de xelas bû. Belê ev guhertina rejîmê ye. Guhertina vesayetê ye.” Yıldırım da zanîn ku dê vî hefteyê li ser mijara dirêjkirina Rewşa Awarte (OHAL) biaxivî û ji bo parvekirinê medyaya civakî dîsa gefên dozvekirinê xwarin. **ENQERE**



Pêşnûme tê rojeva meclisê

Pêşnûmeya guhertina qanûna bingehîn a ku di nav de “sîstema serokdewletiyê” jî heye dê roja duşemê li Civata Giştî ya Meclisê bê nîqaşkirin. Têkildarî pêşnûmeya guhertina qanûna bingehîn a ku MHP û AK Partiyê li hev kirin û di nav de “sîstema serokdewletiyê” jî heye dê roja duşemê li Civata Giştî ya Meclisê nîqaş dest pê bike. **ENQERE**

Rûspiyan yekitî anî ziman

Di warê yekitiya kurdan de rûspiyan kurdan destnîşan kir ku bi lidarxistina Kongreya Netewî ya kurd dê serkeftin bi dest bikeve.

Yek ji kesên li bajêr tê nasîn û rûspiye eşira Nasirî Mehmet Kaya (68) ê li Gundê Kortepe yê Qerejdaxa Amedê rûdinê destnîşan kir ku ji bo yekitiya kurdan çî ji destê wan bê dê pêk binin. Kaya anî ziman ku tekane çareserî di tifaqa kurdan de

ye û wiha axivî: “Kî çî dibêje bila bibêje, çî dike bila bike. Roj ji bo kurdan, roja yekitiyê ye. Divê kurd tifaqa xwe bi pêş bixin.”

Mela Şakir Yilmaz (63) ê li navçeya Pasûrê dijî got ku li ser gelê kurd zilmeke pir mezin heye û wiha got: “Ji dêvla em li hemberî hev tê bikoşin, divê em werin gel hev. Heke kurd di sedsala 21'emîn de yekitiya xwe ava bikin, dê bibe sedsala kurdan.

Wê kes nikaribe li pêşberî hêza kurdan raweste. Roj roja yekitiyê ye.”

Abdulbarî Tiryakî (78) destnîşan kir ku, di serdemek wisa de pêdivî bi yekitiya kurdan heye, di serdemekê ku kurd li herêmê aktor in de divê yekitî pêk bê. Mela Kutbettîn Bayler (71) ê ji Farqîna Amedê ye, diyar kir ku dê kurd yekitiya xwe pêk binin û sala 2017'an bibe sala kurdan. **AMED - DÎHABER**

Divê çend kes bîn kuştin?

Berdevkê HDP'ê Ayhan Bilgen ê di komcivîna partiya xwe de axivî, diyar kir ku biryara ku der barê parlamenterên girtî de daye jî nayê bîra Dadgeha Makeqanûnê (AYM).

Bilgen têkildarî êrişê li dijî kluba Reinayê jî nîrxand û ji bo kesên ku xizmetên xwe wînd kirine sersaxî xwest û wiha got. “Ji bo êrişê li Reinayê daxuyaniyên balkêş tên dayîn. Şewirmendê serokomar dibêje li piştê vî êrişê Amerika heye. Ger hûn tiştêkî dizanin ji gel re parve bikin û çima hûn vedîşêrin, ger agahiya we tune be çima civakê dixapînin. Di 2 mehên dawîn de zêdetirî 100 kes hatin kuştin. Ji bo ku Wezîrê Karên Hundir îstîfa bike divê çend kes bîn kuştin.”

Bilgen anî ziman ku bingeha êrişan 5 sal berê ji aliyê Tirkiyeyê ve hat avakirin û wê demê li Îskenderûnê şervan dişandin Lîbyayê. Bilgen destnîşan kir ku di encama politikayên Tirkiyeyê yên li Sûriyeyê li Reina, Pirsûs û Enqereyê komkuji pêk hatine.

Dem a ku em dibêjin şermezarkirin têrê nake û partiyên ku nerazîbûn nîşan dan,

niha dibêjin şermezarkirin ne bes e lê tiştêkî baş e. Divê siyaseta berpirsiyariyê bigire ser milên xwe, fêmkirina vî yekê jî baş e. Lê dema ku em mijarê bi geşedanên li herêmê re negirin dest hûn ê tenê tedbîrên polîsiye bigirin.”

Bilgen bal kişand ser girtina rojnamegeran û anî ziman ku heke darbe pêk bihata jî Ahmet Şik dê bihata girtin. Bilgen da zanîn ku heta Tirkiye bi şaşiyên xwe re rû bi rû nebe li welat tundî û kuştin bi dawî nabin. **ENQERE**



'Ji bilî demokratîkbûnê hemû rê diçin Sevrê'

SADIVE ESER - AHMET KANBAL / STENBOL - DÎHABER

Dîrokna û nivîskar Erdogan Aydın, gotina Serokomar Erdogan a “Ger ku em rawestin, em dê xwe di şertê Sevrê de bibînin” bibîr xist û wiha got: “Çareserî komara demokratîk, azadîparêz û laîk e. Ji bilî ve

rêyê hemû rê diçin sevrê.”

Erdogan Aydın, bal kişand ser politikayên AKP'ê yên li hemberî rojavayê Kurdistanê û diyar kir ku Tirkiye hêj xeyal dike ku kurd nikarin xwe bi rêve bibin. Aydın, da zanîn ku PYD jî ber ku li Rojhilata Navîn pîrengî, laîk û pirçandiyê diparêze, êdî ne pêkan e

Hase

Dawiya wan bi destê wan be



Fehim Işık

iskifehim@gmail.com

Şewirmendê Erdogan Burhan Kuzu piştî hilbijartina 7'ê Heziranê di Twittera xwe de gotibû, “Tirkiyeyê kaos hilbijart.” Wateya vî peyvê aşkera bû. Em dizanin, encamên 7'ê Heziranê ew ê rêveçûyîna jiyandê jî biguheranda. Her kes ew

ê bi rengê xwe di nav jiyandê de ciyê xwe bigirta. Lê yên wekî Kuzu ji jî aliyê xwe ve berdêla vî yekê dizanibûn. Gelên Tirkiyeyê û baweriyên cuda ew ê bi azadî bikariba bijîn, lê di serî de sîdarên wekî Erdogan û rayedarên din ên wekî Kuzu ku ji qirêjiyan berpirsiyar in, di nava jiyana azad û demokratîk de nekariba ciyê xwe bigirin. Ciyê rûreş û tarîxwazan di nav jiyana azad û demokratîk de tune bû. Nişana twîta Kuzu ev bû û desthilatdaran jî bo vî yekê bi zanebûnê kaos hilbijart.

Di mezinkirina kaosê de di serî de şerê li Sûriyê û herî dawî jî hewldana darbeya 15'ê Tirmehê, bûn derfeta desthilatdaran. Erdogan, ew derfet hem jî bo mezinkirina kaosê, hem jî ji bo desthilatdariya xwe bikaribe mayînde bike, bi kar anî. Her ku şer û tîk dan, mezin bûn; vî jî nijadperestî mezin kir. Her ku mirinên li kolanan zêde bûn, wan jî xwe zêdetir bi xwîne da nasandin.

Niha derdê desthilatdaran ne tenê qaîmkirina iktidara wan e. Ew wisa difikirin ku êdî iqtidara wan qaîm e û kes nikare pêşî li wan bigire. Meclis di destê wan de ye. Bêyî ku xwe bi zagonan girê bidin rêveberiyê dimeşînin. Dadwerî girtine bin bandora xwe. Hemû siyasatmedar, nivîskar, rojnameger, hunermend, çalakvan, ango dijberên desthilatdariya Erdogan an li zindanê ne yan jî hatine bédengkirin. MHP, wekî şaxa Yozgatê ya AKP'ê dixebite. CHP jî ji MHP'ê kêmtir e, ew jî wekî şaxa İzmirê ya AKP'ê ye. Muxalefet tenê li ser piştê HDP'ê û hin aliyên çepgir, demokrat û azadixwaz maye, lê ew jî ji hemû aliyên ve hatine qefaltin.

Erdoganê ku ji desthilatdariya xwe bawer e, ji niha pê ve ne tenê ji bo hikumraniya xwe mayînde bike, bixebite. Ew ê her wisa ji bo sîstema xwe ya rêveberinê jî mayînde bike, hewl bide. Sîstema wî ya rêveberinê jî dewletekê sunnî, îslamî û tirkperest e. Ango siyaseta kemalistên sor çû, ji dêvla wê siyaseta erdoganîstên kesk hat. Di dibistanan de himê ve sîstemê tê avêtin. Di hemû saziyên dewletê de êdî ev sîstem ciyê xwe dibîne. Fetwaya Dîyanetê ya li dijî pîrozkirina sersalê, bingeha xwe jî vî mantalîteyê digire.

Qet şik nîn e; ew ên ku ji teqînan sîd werdigirin û tîrsa civakê jî bo desthilatdariya xwe bi kar tinin; ew ên ku ji bo pêşî li destkeftiyên kurdan bigirin berê leşkerên xwe didin Sûriyeyê û wan li wê derê didin kuştin, nikarin ev desthilatdariya xwe ya qirêji heta dawiyê bimeşînin. Dawiya desthilatdariya wan dê were. Wan xwest ji kaosê sîd wergirin, lê niha ew kaosa ku xwe bi xwe derxistine, ew ê bibe sedema têkçûna desthilatdariya wan. Ango dê dawiya xwe bi destê xwe binin.

ku tîk biçê. Aydın, destnîşan kir ku di vî şerê heylî û peymanî hatiye îmzekirinê de tu tişt jî Tirkiyeya AKP'ê re namîne û Sûriyeya Esadê êş û tola xwe jî Tirkiye hilîne. Aydın, da zanîn ku divê Tirkiye hem li hundir û hem jî li derve jî nûve li pêvajoya aştiyê û çareseriyê vegere.

Periyên çiyayan

Li ber dilê gelê kurd ew şervanên daw û doza kurd û Kurdistanê ne. Gerîlayên azadiyê ku bi salan e li çiyayên Kurdistanê ne, bi jiyana û şeweyê têkoşîna xwe her tim bal kişandiye



SERVAN NÊRGİZ – BEHDÎNAN / ANF

Gerîla her kêliya jiyana bi ‘şer û têkoşînê’ dimeşîne. Jiyana her tim di nav şert û mercên awarte de didomîne. Wan soza azadiyê daye vî gelî. Em bi kîjan gotinê gerîla pênasê bikin ji aliyên cuda, aliyên xweser ên gerîla hene. Rastiyên xwe hene ku mêjiyê mirovan têra fêmkirina wan, dilê mirovan têra rakirina wan nake. Ji ber vê yekê me xwest pîrsa ‘Gerîlatî çi ye?’ ji gerîla bi xwe bipirsîn.

JI BO JIYANEKE RAST

Alîşêr Ûrfâ gerîlayan wek “şervanên azadiyê yên ku ji bo civakê şer dikin” pênasê dike. Alîşêr Ûrfâ dibêje: “Lêgerîna gerîla lêgerîna jiyana rast e. Hem erdnîgariya Kurdistanê, hem têkoşîna bi salan a gelê kurd û rêxistinê me, hem hesta welatparêziyê ya li nav ciwanên kurd û hem ji hesreta Kurdistanê berê min da çiya.” Gerîla Alîşêr destnîşan dike ku hebûna li erdnîgariyê bi vî rengî nabe para her kesî û wiha dewam dike: “Gerîla bi xwe, erdnîgariya xwe, mirovên xwe, dewlemendî û cihêrengiya xwe bê hempa ne. Li cihêkî bi vî rengî gerîlatî, bûyîna şervanên azadiyê tiştekî gelekî cuda ye. Em ji bo jiyaneke rast şer dikin, dibin gerîla. Navê gerîla jiyana e. Diyarkirina jiyana û çarenûsa gelekî ye. Gerîla şervanên azadiyê ne.”

JIYANEKE PIRALÎ

Gerîla Karker destnîşan dike ku jiyana gerîla yek alî nîn e. Gerîla Karker Wan ku demeke dirêj di zindanên dewleta tirk de ma, piştî ku derket yekser berê xwe da çiyayên azad. Demeke dirêj e li çiyayên biheybet ên Kurdistanê li Zagrosan gerîla ye. Her meşa xwe wekî meşa jiyana bi nav dike û dibêje: “Hemû tiştên me ji me girtine, di destê me de tenê gerîlatî maye.” Ji bo pîrsa ‘Gerîlatî çi ye?’ Karker Wan vê bersivê dide: “Gerîlatî destpêkirina jiyaneke nû ye. Bûna ecemiyê jiyana nû ye. Ya rast, her tişt e. Ji ber ku mirov ji nû ve tîndîyayê, bi rengêkî rasttir hîn dibin. Yanî mirov jiyana çêtir fehm dikin. Ji jiyana me ya beriya niha cudatir e. Gelek tişt di nav de heye. Ger mirov timî xwe ecemî bihêle, hingî mirov dikarin gelek tiştan hîn bibin û bîafîrînin. Lewma jiyana yek alî nîn e. Mirov bi xwezayê dijîn. Bi xwe dijîn. Bi civakê dijîn.”

BERPIRSYARIYA DÎROKÎ

Gerîla Botan Agirî ku dema li Zanîngeha Hacettepeyê beşa mamostetiyê dixwend nêrinên şoreşgerî nas kirin û tev li gerîla bû. Agirî wiha behsa gerîlatiyê dike: “Gerîlatî ne tenê rahiştina çekê û şerê li dijî dijmin e. Dema her gerîla nû tev lê dibe, daxwaza xwe ya destpêkê rahiştina çekê û şerê li dijî dijmin e. Lê belê şerê me ne tenê rahiştina çekê û şerê li dijî dijmin e. Em şereki mezin ê jiyana, bîrdozî û rêxistinî dimeşînin. Gava destpêkê ya ber bi gerîlatiyê ve, xwegihandina jiyana nû ye. Ew qas şahadet hene. Rêbertî dîlgirtî ye. Jin, zarok, kal û pîr îşkence û zordarî li gelê kurd tê kirin. Rastiyêke bi vî rengî heye. Gerîlatî tê wateya rabûna berpirsyariya dîrokî ya li pêşberî vê yekê.”

MEŞANDINA ŞERÊ MEZIN

Gerîla Erdal Çermik ê bi salan li Avaşin gerîlatî kiriye, şerê gerîla wekî şerê ‘nefsê’, ‘şerê ekber’ bi nav dike. Çermik destnîşan dike ku şerê gerîlatiyê bi giranî di kesayetiye de, di mêji de tê meşandin û wiha bersivê dide pîrsa me: “Em dixwazin cewhera mirovahiyê, ya kurdîtiyê derxin holê. Di îdeolojiya me de ev heye. Bêguman bicihanina vê yekê di nava mirovên kurd de zehmetiyên xwe hene. Lewma şerê me di mêji û kesayetiye de tê meşandin. Mîna ku di olan de qala wî tê kirin, şerê nefse, yanî şerê mezin ‘ekber’ tê meşandin. Şerê me yê herî mezin şerê me yê li dijî nefsa me ye. Mîna ku Rêberê me dibêje ‘ji sedî not şerê me li dijî kesayetiye me, ji sedî deh ji li dijî dijminê meşandin’. Rastiya me ev e.”

XWEDÎTINA MIROV

Gerîla Stêrk Welat ku ji koledariya pergale li ser ferz dikir reviya, bi wêneyên xwe yên xêz dikirin, ket nav lêgerîna rastiyê, dît ku rastî li çiyayên azad e û tevî du hevalên xwe tev li nava refên gerîla bû. Welat da xuyakirin ku gerîlatî reva ji pergale ye û der barê gerîla de wiha axivî: “Di nav civakê de her mirov pêwîstiyê dibîne ku bi rê û rêbazekê xwe ifade bike. Hin mirov bi hunerê, hin bi helbestan, hin ji bi xêzkirina wêneyan... Ger nikaribe nêrinên xwe vebêje, hingî dikeve nav lêgerînekê. Nexwe dilê mirovan rehet nabe. Gerîlatî di heman demê de lêgerînek e. Reva ji koledariyê ye ku pergale li ser ferz dike. Lêgerîna li xwe û nasnameya xwe ye. Xwe dîtina e.”

‘LÊGERÎNA WEKHEVIYÊ’

Gerîla Norşin Wan ji jiyana xwe ya nû wiha vedibêje: “Tu wekhevî, sadetî û dûristiyekê li dora xwe nabîne”. Gerîla Norşin Wan a da dû xeyalên xwe yên zarokatiyê ji Wanê tev li nav refên gerîla bû û wiha got: “Min gelekî dixwest rêxistinê nas bikim. Dixwest bibimim bê gerîla li çiya çi dikin? Ji min hebû ku gerîla tenê li çiya dimeşe.” Gerîla Norşin anî ziman ku dema mirov mezin dibin dikevin nav lêgerînekê û ev li axaftina xwe zêde kir: “Mirov didin pey hin tiştan. Ji ber ku gelek tiştên mirov qebûl nekin pêk tên. Ji malbatê heta derdorê, ji dibistanê heta hemû sazîyên pergale. Tevliheviya sistemê berê mirovan dide nava lêgerîneke sadetiye. Dixwest nava lêgerîna wekheviyê. Ev lêgerîna ji mirovan digihîne gerîla.”





Temaşevan ji filmê
baş hez dikin

Gelek filmên li Tirkîyeyê hatine kişandin, di demên dawî de di qada neteweyî û navneteweyî de balê dikişînin. Yek ji van filman filmê derhêner Kivanç Sezer a bi navê 'Baskên Bavê Min' (Babamin Kanatları) bû. Filmê ku balê dikişîne ser rastiya gelê kurd û karkerên însaatê, di 23'yemîn Mîhrîcana Filman a Edenê ya Navneteweyî û di 53'yemîn Mîhrîcana Filman a Antalyayê ya Navneteweyî de xelat girtin. Derhênerê filmî Sezer diyar kir ku peyva 'Em ê di badekê de hel bikin' zêde ne rast e û aşkera kir ku temaşevan ji filmên xweş hez dikin. AMED



Pirço û çîrokên
bo zarokan

Gelek weşanxaneyên kurdistanî di demên dawî de bi dehan pirtûkên kurdî weşandin. Di nav van pirtûkan de pirtûkên ji bo zarokan jî hene û gelek ji wan çîrok in. Pirtûka bi navê 'Pirço' jî yek ji van pirtûkan e. Pirtûkê jî 48 rûpelan pêk tê û çîrokên ji bo zarokan hatine amadekirin, tê de cih digirin. Pirtûkê ji weşanên Ensîtutiya Kurdî ya Stenbolê ku berî çend rojan jî hêla Wezaretê Karên Hundir ve hat girtin, hat derxistin. Pirtûka çîrokên ji hêla Orhan Budak ve hatiye amadekirin. STENBOL



Ji şanoyê bê
par nemînin

Di sala 2016'an de li Kurdistanê Tirkîyeyê gelek mîhrîcanên şanoyê hatin lidarxistin û gelek lîstîk hatin pêşandan. Lê jî ber ku qeyûm tayînî şaredariyên DBP'ê yê li Kurdistanê hatin kirin, di serî de mîhrîcanên şanoyê û filman hatin qedexekirin. Lê dîsa jî şanoger û derhênerên kurd qedexeya qeyûman nas nekir û mîhrîcan hatin lidarxistin. Di meha çileyê de jî de mîhrîcan bîn lidarxistin. Ji van mîhrîcanan yek jî Mîhrîcana Şanoyê ya Stenbolê ye û de di meha çileyê de gelek lîstîkên şanoyê yê ku promiyeriyên xwe pêk anîne derdikevin pêşberî şanohezan. Lîstîkên ku de di 4'ê mehê de dest pê bikin heta 30'ê mehê de bidomin. Bernameya şopandinê li ser IKS'ê hat parvekirin. STENBOL

Cemîlê Horo û diyariyên bo Neşet Ertaş

Der barê dengbêje kurd Cemîlê Horo yê ji Efrînê deheta niha kêma agahî hene. Lê di çanda kurdî ya devkî de gelek berhemên hêja afirandine û her yek ji wan xwedî destaneke dîrokî ye

NAVENDA NÛÇEYAN

Kurdên ji pençê qirkirina çandî ya netewedewletê re derbas bibin û dema li xwe mikur neyên, ne pêkan e ku careke din bi ser xwe de bînin. Di vî nivîsê de jî rastiya du kurdan ên wekî Cemîlê Horo û Neşet Ertaş bi awayekî şênber dertê holê û rastiya me kurdan dide nişan.

Dibe di civaka kurd de gelek kes der barê dengbêj Cemîlê Horo de ne zêde xwedî agahî bin, dibe kes nizanibe ku wî jî wek bi dehan dengbêjên kurd bi dehan berhem afirandine. Lê Cemîlê Horo jî di aliyê muzîk û çanda kurdî de xwedî xebatên gelekî girîng û hêja ye. Di vî derbarê de piştî hin lêkolînan hin agahiyên girîng der barê dengbêj Cemîlê Horo û hunermend Neşet Ertaş de derketin holê.

Dewleta tirk bi salan bi rêya 'hunermendên' wek İbrahim Tatlıses, İzzet Altınmeşe, Neşet Ertaş û gelekên din stran û kilamên kurdî wergerandin zimanê tirkî. Di vî nivîsê de

em dixwazin balê bikişînin ser berhemên dengbêj Cemîlê Horo. Ev dengbêjê hêja jî herêma Reşî ya Çiyayê Kurmanc e, ev herêm girêdayî bajarê Efrînê yê rojavayê Kurdistanê ye. Di sala 1934'an de hatiye dinê û di sala 1989'an de çûye ser dîlovanîya xwe.

Dengbêj Cemîlê Horo di sala 1972'yan de bi hunermenda kurd Eyşe Şanê re kaset jî amade kiriye û gelek stran bi hev re gotine. Bi taybetî di vî kasetê de Eyşe Şan û Cemîlê Horo kilama 'Memê Alan' û 'Ji siltanên kurdan re tim û tim wêl wêl' jî dibêjin.

Bêguman xebatên dengbêj Cemîlê Horo bi van re nikare bîn sînorkirin. Dîsa di 10'ê mijdara 1980'yan de li Çiyayê Seydo yê Helebê kaseteke kurdî tijî dîke. Cemîlê Horo di serê kasetê de dibêje ku ev kaset Neşet Ertaş jî wî xwestiye û wî jî ev kaset diyarî kurdên li Tirkîyeyê kiriye. Horo di demên pêş de jî tîkîliyên xwe yê bi Neşet Ertaş re berdewam dîke. Di van hevdiyan û nivîsan de jî tê dîtin

ku Neşet Ertaş jî bi eslê xwe kurd e. Lê Ertaş di tevahiya jiyana xwe de rojekê behsa kurdbûna xwe nekiriye. Wî bi xwe jî stranên kurdî wergerandine tirkî. Yek ji van stranên jî strana gelêrî ya kurdî a bi navê 'Min te dîtibû' ye û di bin navê 'Gonul Dagi' wergerî tirkî kiriye.

Jİ DUTAXÊ YE?

Lê hazirî qala Neşet Ertaş hatiye kirin, divê hin lêkolînan dîroknasan ên der barê Ertaş de bîn parvekirin. Mînak nivîskar Yaşar Kemal Evdalê Zeynikê wekî Homerosê kurd pênase dîke. Dîsa nivîskar Mehmet Uzun der barê Evdalê Zeynikê de gelek lêkolîn kirine. Lê ev her du nivîskar jî der barê nebiyên Evdalê Zeynikê yê serdema me de tu agahiyekî nadin. Lê nivîskar Ahmet Aras ku tê gotin wî li ser Evdalê Zeynikê gelek lêkolîn kirine, der barê Ertaş de gelek agahiyên girîng dide.

Aras di lêkolînan xwe yê ku parve kirine de, aşkera dîke ku Neşet Ertaş nebiyê Evdalê

Zeynikê ye, malbata wî jî gundê Mele Hesen a navçeya Dutaxê ya Agiriyê koçî Anatolyaya Navîn kiriye. Malbat piştî demekê li Anatolyayê dimîne û digere, herî dawî li herêma Çiçekdagi ya Kirşehîrê bi cih dibe. Evdalê Zeynikê di navbera salên 1880 û 1913'yan de jiyaye û hozanekî kurd e. Aras piştî dîke ku Muharrem Ertaş yê di sala 1913'yan de hatiye dinê û di sala 1984'an de çûye ser dîlovanîya xwe, nebiyê Evdalê Zeynikê ye. Muharrem Ertaş bavê Neşet Ertaş e. Lê her du jî ne wek hozanên kurd, wek hozanên tirk tîne zanîn.

HIN BERHEMÊN HORO

Wekî me li jor jî bi bir xistibû Cemîlê Horo bi Ayşe Şanê re jî gelek stran gotine. Dîsa bi dehan kilamên wî hene û gelek berhem afirandine. Ev berhemên jî hêla Cemîlê Horo ve hatine gotin wiha ne: 'Memê Alan', bi Eyşe Şanê re gotiye, 'Lo bavo', 'Keleha Bazîdê', 'Şahiya Qamişlo' (Helbest) û 'Eyşoya İbo' jî dehan stranên tenê çend stran in.



Hemû xweşikiya golê bû pirtûk

Nivîskar Ayşe Çavdar xebatên xwe yê Komeleya Çand û Huner û Ekolojîyê ya Glayê di pirtûka bi navê 'Gola Gza, bi Golayê re 10 sal' de berhev kir. Pirtûkê wekî belgefilmeke herikbar e. Di pirtûkê de mirov hem çand û nasnameya lazan û hem jî zozanên Behra Reş a Rojhilat dibînin.

Welatîyên ji Rojhilatê Behra Reş 10 sal berê Komeleya Çand, Huner û Ekolojîyê ya Gola nas kirin. Piştî vî li zozanên wê Mîhrîcana Zozanên Kesk hat

lidarxistin. Bi dehan kes jî bajarên cuda yê Tirkîyeyê berê xwe dida Rojhilatê Behra Reş. Yê tev li mîhrîcanê bûn mîmariya wê geriyên û tev li çêkirina hilberînên herêmî bûn. Bi dehan aktivîst û dil-daran jî kedeke mezin da



mîhrîcanê.

Mîhrîcan cara 10'emîn hat lidarxistin. Nivîskar Ayşe Çavdar jî hemû xebatên Golayê di pirtûka bi navê 'Gola Gza bi Golayê re 10 sal' de berhev kir. Pirtûkê jî weşanên Heyamola derket û

nîha li pirtûkxaneyan tê firotin.

Pirtûkê bi sernavên wekî 'Naskirina Golan', 'Zozanên Kes mîhrîcaneke cuda ye', 'Gola herêmeke navber e' û bi

tevahî di bin 13 sernavên de hatiye amadekirin. Çavdar di pirtûkê de cih daye roportajên kedkar, dildar, xebatkar û temaşevanên Gola Gza.

Her wiha di pirtûkê de li ser girîngiya zimanê lazî jî hatiye sekinîn û di çarçoveya mîhrîcanê de jî di hemû bernameyan de li ser girîngiya lazî hatiye sekinîn.

Her wiha di pirtûkê de cih dane nêrîna Şîna ya 10 salî jî. Şîna di Koroya Zarokan a Gola de cih digere. Çavdar di dawîya pirtûkê de hedefên pêşerojê yê bi Gola re vedibêje. Civaknas Nilufer Taşkın jî dibêje ku divê Gola serxwebûna xwe berdewam bike.

Problemê estene yê Erdoganî



■ KASIM ENGİN

Nê rojan de yew munaqêşe dest pêkerdo: Problemê estena... Yanî babeta 'mendebîyayîş û nêmerdîşî. Eke merdim hîna aşkere vajo, 'Problemê parçebîyayîş û vilabîyayîşê Tirkîya.

Hêzê îqtîdarî her tim bi hawayêk nişan dayî ke Tirkîya bi tehlukeyanê girdan rî bi rî ya û bi no hawa hewl dayî ke şarî bi no hawa kom bikerî. Dinya de raybazê tewr ercan yê idarekerdişê merdiman; "ma ver bi vilabîyayîşî şonî, her kes dişmenê ma yo, ma bine hêrişan de yî, proses yê merg û estena yo..."

Yê ecêb, bi siloganê ya îstîklal yan zî mergî çîyo ke hedef beno yo. Bi no hawa hetêk ra hetê faşîstî dormeyê beyraqe de yenî komkerdiş û heto bîn ra zî bin nameyê pawitişî de 'parçekerdoxan' ser de lîncî yenî kerdîş

Nuqtaya ortak ya rejîmanê diktayan tim wina biyo. Wextê xo de Hafîz Esadî, şarê Sûriye bi vatişê 'Israîl wazeno erdê ma dagîr bikero' bi rewşa îstîsnayî idare kerdo. Reyna Sedamî zî eynî raybazî gurênayo. Tirkîya xo ra roja sifteyîne ra nata wina ya.

Labelê nê rojanê peyênan de na meseleya estena, heme wextan ra hîna zafêr yena zîwan. Vatişê 'Ya îstîklal, ya merg', 'ya rizgarî ya merg' qet fekan ra nêkewenî. Mîyanê meseleya merg yan zî estena de waştîşê resayîşê duştê şehîdî zî esto.

Yê ecêb, bi siloganê ya îstîklal yan zî mergî çîyo ke yeno hedefkerdiş o. Bi no hawa hetêk ra hetê nijadperest û faşîstî dormeyê beyraqe de yenî komkerdiş û heto bîn ra zî bin nameyê pawitişê xo vera yê ke wazenî welatî parçe bikerî de kenî û nê parçekerdoxan ser de lîncî yenî kerdîş.

Reyna seba ke parçekerdoxî estî, Tirkîya de her sinîfe ra merdiman anî têhet. Merdim awankerdişê senaryoyê vilabîyayîş û parçebîyayîşî yê faşîst, mezhebperest û nijadperestan eşkeno fam bikero. Şêrê psikolojîk duştêko winasî de yeno gurênayîş ke, roşnîvîr û demokratî ke yenî şinasnayîş zî xo nê pêlê hêrişan mîyan de vînenî. Wina aseno ke hetê çîyayî ke mîyanê inan de yê Erdoganî ra hes nêkenî zî estî, no het de îkna biyî, bawerîya xo şero psikolojîk rê esto. Vera na pêla faşîzmî de têkoşîn nêdayîş zî nêyî reyde eleqeder o. Goreyê nînan yê ke wazenî welat parçe bikerî mîyan de yê sereke kurdî yî. Cok ra heme dezge û sazîyê kurdan ser de hêriş, qedexê, kiştîş û qetilk-erdişî benî. Ma nêyî bi hawayo aşkere vaji; kurdê azadîwaştî yanî kurdê Apocî, heta nika bi desan reyde îzeh kerdî ke ê



wazenî çarçeweya yewîya Tirkîya de idareyêko xoser de bicuyî û nê waştîşê xo zî bi deklarasyonêk raya pêroyî rê aşkere kerdî. Hetta kurdê azadîwaştî bi desan reyan watî ke ançax şinasnayîşê şaran yê yewbînan, merdim eşkeno Rojhelato Mîyanên de vera vernîya parçebîyayîş û vilabîyayîşan de vîndero û kurdan nê vatişê xo bi paradîgmayêk aşkereyê dinya kerdo. Cok ra parçebîyayîş û vilabîyayîşê Tirkîya kurdan ra girêdayîş, şero psikolojîk yê tewr gird o.

Rayber Apoyî bi hawayêko aşkera wina vatbî: "Seba bîyayîşê netewe, nazariyeya neteweya demokratîke wayîrê zîhnîyetê sînorê sîyasî yê wişk nîya. Hetta neteweya demokratîke eşkena netewanê çîya-çîyayan eynî mekanî de bîyaro têhet. Yanî komê neteweyî yê girdî ke seba sînoran tim yewbînan reyde şer kenî û komê neteweyî yê şenikan ano têhet û reyna kêmhûmaran mîyanê yewîya neteweyî de ano têhet û hîna zêde demokrat, azad û seyyewbînanî awan keno. Tena pêardîşê na îlke daxî polîtîkayanê 'parçe bike û idare bike', 'hargûş bireme, taji bitepişe' yê sîstemê hegemonîkî eşkeno veng bivejo."

Eke ma diqet bikerî, yê ke xo bi fikrê neteweya demokratîke aver berdî, ti problemê inan yê nasname, beyraqe û erjê tirkan reyde çin o û heta rêze zî nişanê nê erjan danî.

Apocîti felsefeyêk a, hem zî felsefeya biratî ya ke bingeyê ci

de komelî estî. Yê ke wina yî, çî eleqeya xo bi parçekerdiş û dişmenîya şarê tirkî estî?

Labelê na zî raştîyêk a; problemê kurdê azadîwaştî-xan bi AKP û Erdoganî esto. Yanî problemê nê kurdan vera Erdoganî ke tena qirk-erdişê kurdan fikirreno û sey gayê Îspanyolan hêrişê erjanê kurdan keno de esto, no xususî yewin o.

Xususî dîyîn zî dinya de problemê zaf kes, sazî, dewlet, sermayeya miyanneteweyî û hetta hêzê çeteyan bi Erdoganî esto. Çimkî Erdoganî Sûriye de piştî dayo çeteyan û kardî dayo piştîya F.Gulen, Yewîya Ewropa, Amerika û sermayegozaran ro. Verê hemînan reyde karanê lêmînan kerdo, sey ke 'heta pirdî ra bivîyaro heşî ra vajo, xalo' dima ra yew bi yew paşkul dayo hemînan ro. Nika yê ke ê paşkulî werdî, sond werdî ke paşkulî bidî Erdoganî ro.

Xususî hîrêyine zî, Erdoganî cîranê ke verê cû sey birayî diyêne, yew bi yew hemînan rê terori îxraq kerd û inan kirant mîyanê kaosî. Ya bîn zî ê seba ke hesabê xo Erdoganî ra bipersî, sond werdî.

Yanî sey ke AKP û Erdogan vanî problemê estena Tirkîya çin o, problemêk esto û o zî problemê estena Erdoganî yo. Xora no zî problemê mendîş û nêmerdîşî nîyo, tam çepê ci de kura de û do senî rayîr şêro, problemêko winasî yo.

Bena hol

Fragmanê 2017î



U. Serhildan Xonçikij
serhildan.andan@gmail.com

2016 zaf zor vîyart. Çiyî ke ameyî qewimîyayîş wina rehet vîrê merdiman ra nêşinî. Aye ra gere her çî ra ver merdim muhasebeyê 2016î baş bikero û goreyê aye zî 2017î ra çîyanê neweyan bipawo.

Mi waştêne no quncîko ke serra newîye de ma rê ame cêrakerdiş de nuştîyê xo yo ewilî de behsê aşî û azadî bikerî. La no welat de rakewtişê nê saetan ra dima çî qewimîyeno merdim nêzano, no zî waştîş û xeyelane merdiman ra tesîrêko pîl keno.

Sey her serre emser zî samedê serra newîye beyanatî ameyî dayîş û bê îqtîdarî gelek hetan ra samedê aşî û demokrasi mesajî ameyî dayîş. La ê kesî ke muhasebeyê 2016î baş kerdî xo ra zanayêne ke do 2017î de çî biqewimîyo, tabî nê kesî tay îxtîmalan ser nê çîyan zanayêne yan zî fikirayêne. Çunkî sere de goreyê kurdan û pêroyî de zî goreyê gelek hetî ke 2016î binê tedayan de cuyayî, çîyayîya 2017î, 2016î ra çin a.

Ê zanî ke parlementer, şaredar, idareker û gelek merdimê inan peyê berî de kewtî serra newîye, ê zanî ke gelek hetê welatî de laj û kênayê inan binê bombardumanî de kewtî serra newîye. Aye ra 2017 samedê inan çiyêk ifade nêkeno. Welato ke tede her roje yewbînan ra dîribîyayîşê merdiman zêde bo, helbet çiyêko baş nêno hişê merdiman.

Herinda çîyanê başan de aqîle merdiman de tena dîrîvîstîşê çîyayan esto. O zî bi destê hikûmeto ke demêk samedê fikranê xo hetê sîstemî ra amebî dîrîvîstîşî ra yeno kerdîş.

Çî qezenc keno? Çira keno? Esasê xo de her çî orte de yo la hema zî ê kesê ke boçê inan tepîşenî, zêde yî. Ê nêvanî ke no hikûmet welat kerdo adir û adir ma veşneno. Tena sey temaşeger cayêk de ronîştî yî û wexto ke boç wazeno ê, ey bitepişî cayê xo ra leqenê bê aye zî çiyêk nêkenî.

Bi nê çîyan ma kewtî serra newîye. Şewa ke merdimî serra newîye pîroz kerdene yan zî keyeyê xo de tena sey temaşeger ronîştîbî qet nêardene xo vîr ke fragmanê 2017î do temaşe bikerî. Tayî xo rê hêvîyan dima bî tayî zî pawitene ke çiyê başî berî inan ver.

La saete 00:00 vîyart û wexto ke pîrozbayî dewam kerdene, pêroyîyê ajansan de xeberêka lez-gîne amey parekerdiş. Stenbol de hêrişo çekin ameyo meydan û gelek kesî merdî. Yanî roja yewine ya 2017î ke mîlete tira hizur pawitene bî cehenem. Mîyanê o cehenem de 39 kesî merdî û gelek kesî birîndar biyî. Sey her wext îqtîdarî va, 'Do nêşki milê ma çewt bikerrî' û qerarê qedexeyê weşanî diya.

Fragmanêko winasî şewa serr-neweyî de bi kerdenanê dewlete û DAIŞî ame nişandayîş û o zî bes nêkerd, DAIŞ samedê hêrişanê neweyan veng da militanê xo yê ke hucreyanê Tirkîya de yî.

No fragmano lêşin de kurdi çin ê la dewlete zî baş zana ke rayê nê cehenemî ra vejîyayîşî Kurdistanî ra vêreno.



Vîrê tarîxî yê Fîskaya rijîyeno



● Taxa Fîskaya ya Amedî ke netîceyê polîtîkayê veşnayîşê dewan de awan bibî, netîceyê polîtîkayê îstîmlaqkerdişî yê dewlete de rijîyayîşî reyde rî bi rî ya.

Taxa Fîskaya ke taxanê tewr kehen yê bajarî ra yew a, şarê taxe tim vera bajar-bîyayîşî de erjê xo yê komelkî pawito. Taxa ke tede têkîlîya cîranîye domîyena, ewja de şar debara xo bi heywankarî û zîretî keno. Taxe de nîzdîyê 800 keyeyî estî û heme keyeyî yewbînan şînasnenî.

Bado ke Sûr de pêrodayîşî dest pêkerdî, kewtîş û vejîyayîşê taxe de nuqtayê kontrolî yê polîsan ameyî ronayîş. Şarê taxe îxtîmalê rijîyayîşê taxe ver, etîrenî û dîyar kenî ke ê nêwazenî daîreyanê apartmanan de bicuyî. **AMED**

Leşkerê tirkî sey pîyon yenî xebetnayîş



● Nuştox û rojnamegero polonyayî Rafal Grzenîayo ke serra 2013 de bajarê Hama û Îdîlb yê Sûriye de mendbî, kîtabêk bi nameyê 'Şorişê Sûriye' nuşt.

Grzenîyî kîtabê xo de bale anto Bab de sey pîyon xebetnayîşê leşkeranê tirkî û vato 'Tirkîya seba ke pêresayîşê kantonan asteng bikera, dekewta Bab. Reyna Grzenîayî kîtab de vato ke Tirkîya do mecbûr bimana ke xo Bab ra bianca û ti cîyayîya El Nusra û Oso nêmendî. Grzenîayî ciresnayo ke Esad do bimano û Federasyonê Sûriyeya Yakurî do bêro şînasnayîş. **DEMİZLİ**

TOLEDOYA ÎQTÎDARÎ DÎYAR BÎYE Sûr de 6 qereqolî yenî viraştîş

Projeyo ke hukmat seba qezaya Sûrî ya tarîxî amade kerdbî, dîyar bî. Hukmat wazeno Sûr biaçarno herêmêka 'biewle' û nê semedî ra çarçeweya nê projeyî de Sûr de 6 qereqolî yenî viraştîş

HULYA EMEÇ / AMED - ANF

Qezaya Sûrî ya Amedî de netîceyê pêrodayîşê ke 28ê teşrîna peyêne ya 2015 de dest pêkerdbî û 104 rojan domîyabî de hetê hêzê dewlete ra tarîxêk ame qedênayîş. Hema zî tayê warê Sûrî de rijnayîşî dewam kenî û 6 taxê Sûrî de qedexeyê tebervejîyayîşî dewam keno. Netîceyê hêrişan de nîzdîyê 40 hezar merdimî bêkeye mendî.

Qezaya ke bi kilise, camî, hemam, xan û keyeyanê tarîxîyan yeno zanayîş, netîceyê hêrişan de qeza erdî ra bîya yewe. Serekwezîr, wezîr û parlementerê AKPyî seba ke vernîya reaksiyonanê şarê bigirî, vatbî do qeza bibo sey Toledo. Nika bi aşkerebîyayîşê planê îmarî yê Sûrî dîyar bî ke nê vatîşî daxî heme zûrî yî.

28ê kanûne de projeyê Sûrî dîyar bî. Projeyo ke hetê Şirketê Plankerdişî yê BHA ra yeno meşnayîş zî nawneno ke hedefê hukmatî çî yo. Goreyê projeyî rayîrê hîra ke eleqeya xo tarîxî reyde çin î, yenî viraştîş. Nê rayîrî do mabênê 6 qereqolê ke



Sûr de bêrî viraştîş, biresnî yewbînan. Nê qereqolan ra 2ê ci Hasirli de, yê bîni zî Cevatpaşa, Îskenderpaşa, Melîkahmet û Alîpaşa de yenî awankerdiş.

PROJE MUNASÎB NÎYO

Hemsereka Odeya Plankerdoxê Bajarî ya TMMOBî ya Şûbeyaya Amedî Buşra Cîzrelîogullari Sadake babete ser o va 'hukmatî heta nika tim vatênê ke projeyê înan yê seba pawitişê Sûrî estî, la ewro vejîya orte ke nê heme zûrî' û wina

domnaye: "Dima ra planê îmarî ame vetîş û goreyê planê înan do 6 qereqolê girdî Sûr de bêrî viraştîş. Reyna goreyê planî rayîrê hîra ke nê 6 qereqolan yewbînan ra bestenî, do bêrî viraştîş. Labelê ti eleqeya xo bi tarîxê Sûrî reyde çin a. Seba ke Sûr bigirî bin kontrolê xo, qereqolî yenî viraştîş. Heta nika ameyo tespîtkerdiş ke tena Taxa Hasirli de 1300 awanîyî ameyî rijnayîş. Ma do nê hefî de tespîtanê xo bidomnî."

DEWLETE NÊWAZENA

Sadake dewamê qiseykerdişê xo de va 'no proje 28ê kanûne de ameyo vindarnayîş, rewşa asayî de wextê vindarnayîşî 30 rojî yî'



û wina qedênaye: "La bi çarçeweya OHALî de nê wextî ardî 15 rojan. Na rewşê karê ma asteng keno; çimkî wextêko wina teng de ganî ma nê projeyî biresnî şarî. Dewlete wazena nê projeyî bi hawayo nîmite bivîyama û nêwazena ke no proje bêro zanayîş. No proje ganî şarî ra biameyêne perskerdiş. Wazenî bi nê projeyî şarî Sûr ra bivejî. Cok ra wezîfeyêko gird keweno şarê Sûrî ser de. Ganî şar û dezgeyê ke herême de yî, îtiraz bikerî; eke îtirazî bêrî kerdiş, o wext ma do bişînbî porejeyî bivindamî."

Wa şarê Rojawanî bîagêro!



Z. NERGİZ BOTAN / ZENDA DÎROK / BEHDÎNAN - ANF

Erdê Kurdistanî de her ke şer kûr beno koçî zî zêde benî. Merdim ti cayan de nêşkeno sey erdê xo azade bicuyo. Keyeyê Zîn Samuraye zî vera hêrişanê çeteyê DAIŞî koçê Kobanê, Riha û Amed kerdi. Gerîlaya YJA Starî Zîn Samuraye ke Heleb de ameya dinya qala tewrbîyayîşê xo yê gerîla û şerê kurdan kerde.

PKK HÊVÎYA ŞARAN O

Zîn Samuraye qiseykerdişê xo de wina va: "Ez cuya gerîlayan ra zaf teşîr bîya. Têkoşînê tevgerê kurd hêvî dano heme şaran. Gerîlayî vera dewleta tirkî û zîhnîyetê lîşin de şerêko tarîxî kenî. Gerîla tena seba şarê kurdî û şarê Rojhilato Mîyanên ney seba heme şaranê dinya şerê azadî kenî."

NÊAMEYO DÎYAYÎŞ

Zîn Samuraye qiseykerdişê xo yê peyênan de zî qala embazîya gerîlayan kerde û wina qedênaye: "Embazî mîyanê PKKî de çiyêko zaf bi erj a. Tîya de merdim xo ra ver embazê xo fikirîyeno. Cinîyî her ca de yenê pelçiqnayîş. La tîya de wina nîyo. PKK şorişê cinîyan o. Fikrê Rayber Apoyî Rojawan de kewt dewre û şorişê cinîyan virazîya. Rayîrê xelisnayîşê heme cinîyan PKK ra vîyareno. Ganî cinîyî dormeyê tevgerê azadî de bibî yew. Badê ke ez tewrê PKKî bîya, mi baş fam kerde ke kurdî tena eşkenê erdê xo ser de azade bicuyî. Azadî cayo ke vîni bibo, ewja de yeno gerayîş. Wa şarê ma yê Rojawanî biagêro erdê xo."

Tirkîya kurdan ser de bombe varnaye

Nuştoxê rojnameyê Independentî Rober Fîskî qirkerdişê Reîna ra dima derheqê hêrişî de qiseykerd û vînayîşê xo ard zîwan.

Fîskî dîyar kerde Tirkîya 'tena' ya û wina domna: "Sebebê leşkerî yê tenayîya Tirkîya estî. Çimkî Tirkîya şerê Sûriye de bi hawayo leze kay kerdbî û vîni kerdbî. Sînoranê xo ra endam û pereyê DAIŞ, El Nusra û sewbîna çeteyan vîyarnaybî. Reyna Tirkîya vera kurdê welatê xo û yê ke welatê Sûriye mîyan de yî de şer kerdbî. Eke yew diktoro ke şero mîyanên yê welatê cîranan de rolê ci esto, o wext welatê ci de zî qirkerdişî ra zêde sewbîna çiyêk nêbeno. Wexto ke dest dîya Afganistan ro, Pakîstanîjî dîyî ke talîban ver bi Îslamabad meşîyayî. Ewro zî eke ti destê xo bidî Sûriye, bexçeyê to yo peyêne de fişekê hewayî teqîyênî."

AMEYÎ BOMBEKERDIŞ

Fîskî qiseykerdişê xo de bale ant ser bi hawayo rewê bedîlîyayîşê têkîlîyê Tirkîya û wina qedênaye: "Anqara teberê ereban de keylê welatan reyde têkîlîyê xo raşt kerdo. Serekkomar Erdogan 'wisarê ereban' ra dima êdî nêwazeno welatanê ereban bivîno. Nê demê peyênan de vîstîşê teyaraya Rûsya, nîzdîbîyayîşê Serekê dewleta Rûsya reyde, heskerdişê Esadî û dima ra ti ra nefretkerdiş, dîyalogê Ewropa û dima ra şer-mîzarkerdişê Ewropa yê Erdoganî... Yê ke aqilê ci bibo, xo zêde nîzdîyê Xelîfe yanî Erdoganî nêkeno." **AMED**

Cinîyî do doze îdare bikerî

Tirkîya de her ke şono vera cinîyan de hêrişî zêde bena. Îdarekarê Tirkîya zî seba vindarnayîşê qirkerdişê cinîyan ti gaman nêzerenî. Cinîyê bi rêxistinkerde doza cinîyê ke vera şîdetê mêrde de merdî, gîrewtî milê xo ser. Nê dozan ra yew zî doza Nurcan Arslane ke 30ê çeleya 2016 de hetê Abdullah Melîh Barişî ra ameybî qetilkerdiş a. Mehkemeya Melîh Barişî 13ê sibate de Edlîyeya Bakirkoyî de do bêro vînayîş.

Waya Nurcane Gulcan Arslane, Sevdî Aydile û merdimê aye Nihal Arslane qiseykerdî.

'QETILKERDIŞÎ POLÎTİK Î'

Gulcan Arslane qiseykerdişê xo de wina va: "Ma hesiranê xo varna zereyê xo. Ma kuçeyan de broşuran vila kerde. Heyetê Mehkeme waşt ke qatîl pak bivêco û qatîlî nêardî mehkeme. Ma her ke yenê mehkeme

polîsî ma tehdît kenî. Rewşa OHALî de astengî virazîyayî û ma nêşkayî broşuran vila bikerî."

Sevdî Aydile zî wina va: "Çapemenîya hetgirî Nurcane suçdar kerd û vatî 'waştîya pîyo ke 3 domanê ci estî ya'. Seba ke nameyê qatîlî nêro zanayîş, nameyê ci kilm kerdi. Qetilkerdişê cinîyan polîtîk o."

Nihal Arslane zî va: "Ez verê cû wina nêbîya. Badê qetilkerdişê Nurcane ez tewrê çalakîyan bîya. Qewimîyayîşê Nurcane mi zana kerd. Eke ma doze ra fek biverdayêne, beno ke doze wina nêbîyêne zî. Seba heqîqat û seba heme cinîyan ma do heta peynî xo ver bidî." **STENBOL - ŞÛJIN**





Şaredarî tenê paqijkirina

çopan nîn e

Li Edeneyê, ji ber kêmasiyên şert û mercên fizîkî û pirsgrîr-kên Çarşıya Qesaban, hem esnaf hem jî welatî bi gilî û gazinc in. Serokê Şaredariya Barjê Mezîn ê Edeneyê Huseyîn Sozlu û serokê Şaredariya Seyhanê Zeydan Karalar di hilbijartina herêmî ya 30'yê adara 2014'an de sozê de piştevanîya Pêşnûmayê Çarşıya Qesab û Saqatfiroşan a Edeneyê ya nû da, lê piştî hilbijartinê sozên ku dabûn ji bir kirin. Serokê Odeya Qesaban a Edeneyê Saruhan Yagmur diyar kir ku soza ku şaredariyê daye wan bi cih neaniye.

Yagmur destnîşan kir ku Çarşıya Qesaban a li nav Çarşıya Mîsirê cih digire, talûkeyeke mezîna dide derdorê û wiha got: "Li Çarşıya Qesaban, Xwedê neke heke şewatek derkeve de Alî Dede û Karasokulu tune bibin. Çimkî ew der tim wek îmalatxaneyê ye. Tebeqeyên bi tûpan tîn girtin, hemû jî petrolê hatine çekirin. Li gel vê avahî di sala 1913'an de hatine çekirin." Yagmur anî ziman ku şaredariya mezîna sê sal berê soz daye wan lê belê piştî hilbijartinê tîkildarî wir tu xeber nekirine û got ku ji ber ku avahiya mezbaneyê avahiyeke dirokî ye, ew nikarin bizmarekî jî bikutînin.

Yagmur anî ziman ku wan hem jî bo mezbaneyê hem jî ji bo qesaban cihek xwestiye û wiha got: "Berê gelek caran min got. Em dixwazin bazara masîyan bi awayekî modern çêbe. Niha meydana bajêr tê çekirin. Lê em dizanin gelek kes re rastî dozan hatine. Ez ne bawer im kêmi 20 salan ev meydan biqede. Şaredarîvanî tenê ne berhevkirina çopan û rijandina asfaltê ye." EDENE - DÎHABER

Hemû berhem darin



Li Wanê, Ovunç Pehlivan ê bi navê Agaçkakan Atolyesî (Atolyeya Darkutokê) cihekî biçûk vekirîye, darên jî gelek deverên cihanê anîne, dineqîşîne û wan vediguherîne berhemên hunerî. Pehlivan li atolyeya ku li her derê wê bêhna daran tê pirtûkxane, tabûre, gerdanî, guhar, xişir û zînet, metereyên darînî, neynik, saet û hwd. çêdike û wan bi motîfên çanda herêmî dixemilîne.

Pehlivan ê ku yek ji hosteyên boyaxkirina daran e, anî ziman ku ew li ser daran 3 teknîkên cuda bi kar tîne û destnîşan kir ku ew pêşî eşyaya ku bê çekirin xêzkirina wê çêdike û wiha got: "Em tabûre, gerdanî, guhar, xişir û zînet, metereyên darînî, neynik, saet û hwd. çêdikin. Ev berhem sêwirînên min in, hem jî yên me li gorî siparêşên mirovan çekirine. Minak ez li ser berên jî dara merxê motîfên xalîçeyên destan ên Wanê neqş dikim. Li ser hinekan jî figûrên astekan, mayayan û yên Afrikaya Başûr bi kar tînim." Pehlivan diyar kir ku ew

*Li Wanê Atolyeya
Agaçkakan a ji her derê wê
bêhna daran tê, ji daran
pirtûkxane, tabûre, gerdanî,
guhar, xişir û zînet, me-
tereyên darînî, neynik, saet
û hwd. tîn çekirin.
Ev darên ku tîn çekirin
bi motîfên herêmî tîn
xemilandin*

bêtir darên herêmî bi kar tîne û wiha domand: "Carinan ez li ser şaxên darbehîvên hişk ên min ji Girava Axtamarayê behevkerî û carinan jî li ser dargûzên navçeya Şaxê motîfan çêdikim. Em hin darên taybet jî



ji welatên wekî Îspanya, Kosta Rîka, Tunus, Hindistan û hwd. tînin. Lê buhayê wan beran ji yên din cudatir in."

Pehlivan anî ziman ku ew di warê metereyên darîn de li cihanê yek ji wan hosteyan e ku kêmi in û dest nîşan kir ku berên jî daran tîn çekirin zirarê

nadin mirov û xwezayê û wiha pê de çû: "Dema mirov ji bo çayvexwarinekê jî bîn vir, aramiyek li wan peyda dibe. Çimkî li vir her tişt jî daran çêdibe." Pehlivan herî dawî got ku ew dixwaze di demên pêş de kursan bide kesên dilxwaz. WAN - DÎHABER



Bi karê neqîşadinê debara xwe dikin

Gelek malbatên Pîrsûsê jî ber hişkesaliyê û derfetên kêmi in aboriyê koçî Dîlokê kirine û li wir bi cih bûne. Yek ji van malbatan, malbata Hanbulut e. Malbata Hanbulut di 2008'an de ji ber tunebûna avê û derfetên kêmi in aboriyê koçî Dîlokê kir. Zarokên malbatê bi qasî 4 mehan di fabrîqeyan de xebitîn. Zarokê herî biçûk ê malbatê Mihemed Hanbulut ê 19 salî ye.

Ji ber ku hemû xwişk û birayên Mihemed zewicîn û ji malê veqetîyan Mihemed bi dayik û bavê xwe re tenê ma.

Mihemed di 15 saliya xwe de dest bi karê neqîşandinê kir.

Mihemed û bavê wî piştî ku fêrî karê neqîşandinê bûn li taxa Vatan a Dîlokê kargehek vekir. Niha Mihemed û malbata wî bi neqîşandinê debara xwe dikin.

Nexşên ku bi sedan sal berê jinan li Mezopotamyayê bi derzî û tayê li ser etamînen spî bi destan dineqîşandin, niha Mihemed bi makîneyê li ser paçê spî dineqîşîne.

Mihemed diyar kir ku karê ku ew dikin



pir zehmet nîn e û wiha got: "Em şiklên nexşên ku li ser paçên spî çêdikin, bi rêya cd'yan ji kompîturê dadixin. Piştî wê dixin makîneya nexşan û paçê spî dixin ber makîneyê. Dema paçê spî dixin ber makîneyê bi du darên di şiklê elipsê de ji hev dikişîne û makîne li gorî nexşên di cd'yan de dineqîşîne. Piştê jî ez li ser makîneyê derdora wan dineqîşînim û dantêlên ku keçên taxê çêdikin li derdora wan dixim. Em rûyê nivîn, balîf û cihêzên bûkan çêdikin." Her wiha Mihemed anî ziman ku ew herî zêde di mehên payîz û zivistanê de dixebitîn. DÎLOK - DÎHABER

50 sal in bi heman meqes û gustilê dirûnê dike

Terziyê 60 salî Necmetî Çelîk ji gundê Hamur Kesen ê girêdayî navçeya Şahînbey a Dîlokê ye. Malbata Çelîk beriya ku ew bê dinyayê li navçeya Şehîdkamîlê bi cih bû. Çelîk di 10 saliya xwe de dest bi kare terziyê kir.

Çelîk piştî ku bû terzî heta iro heman meqes û gustilê terziyê bi kar tîne. Çelîk piştî dest bi karê terziyê kir di sala 1981'an de di fabrîkayê de dest bi dirûnê kir. Heta 2003'yan di fabrîkayê de terzî kir û di 2004'an de malnişî bû. Lê li gel ku malnişî bû jî dest jî karê dirûn û fesalê ber-neda û niha li taxa Selîmiyê ya Cînderesiya Şehîdkamîl dikanek vekirîye û cil û bergên welatîyên taxê çêdike.

Çelîk anî ziman ku rojekê bavê wî jî wî re şalek kiriyê lê kêfa wî jê re nehatiye û wiha got: "Rojek ez di rê de diçûm û min zilamek dît. Şalê wî utîkirî bû. Min jî dixwest şalê min wek ê wî be. Piştê ez çûm cem zilam. Wê demê min fam kir ku ew zilam terzî ye. Kêfa min jî karê wî re hat û li cem wî dest bi kar kir. Ez bûm çiraxê wî û di 4 salan de fêrî dirûnê bûm."

Çelîk piştî dest bi kar dike hostayê wî dest-pêkê gustilê terziyê dixwe tiliya wî û ew gustilê 2-3 mehan di tiliya wî de dimîne. Ji wê rojê heta niha ew gustilê li gel Çelîk e. Piştî wê, hostayê wî jê re meqesê dikire. Çelîk anî ziman ku ew 50 sal in heman meqes û gustilê bi kar tîne. DÎLOK - DÎHABER



Gundê Delibab mînaka înkâr û îmhayê ye

Li gundê Delibabê yê Xorasana Erziromê li gorî ku bi devkî hatiye gotin kurd û ermenî bi hev re li vir jiyane û di 1914'an de dema qetlîama mezîna a ermenîyan de her du civak jî hatine tunekirin.

Gundiyan ku niha li wir dijîn bi qasî ku çirokên vî gundî dizanin, anî ziman ku elewî piştî ji Xorasana Îranê hatine sirgûnkirin li gundê Delibabê bi cih bûne û wiha got: "Heta 1914'an kurd û ermenî li vî gundî bi hev re jiyane. Lê piştî qetlîama mezîna a ermenîyan çî bi serê wan de hat, ne diyar e. Piştî tunekirina ermenîyan kurdên safî li vir hatin bicihkirin. Lê dîroka vî gundî tu kes tam nizane." Gundiyan destnîşan kir ku li gundê Delibabê dîroke ermenîyan hebûye lê ew dêr jî aliye gundiyan we hatiye

hilweşandin û her wiha gorî ermenîyan jî bi hinceta ku zêr tê de hene, hatine texrîbkirin.

Gundiyan da zanîn ku piştî qetlîama ermenîyan jî ber ku li vî gundî turbeyeke misilmanan hebûye navê gund kirine 'Velîbaba' lê piştê navê gund careke din jî hatiye guhertin û wê carê jî bûye Aras. Gundiyan anî ziman ku şeniyan vî gundî hemû kurdên safî ne.

Her wiha tê gotin ku piştî Peymana Qesra Şîrîn kurdên ku serî hildane li vî gundî hatine bicihkirin.

ERZIROM - ŞOJIN

